# ÇEND FRAGMANÊN FELSEFÎ

ALÎ GURDILÎ

***Ali Gurdilî**, civaknasekî kurd e. Di sala 1966 an de li bajarê Sêrtê, li navçeya Gurdilan/Misircê hatiye dinyayê. Piştî ku di sala 1980 an bi hemû malbata xwe re koçê bajarê Îzmîrê dibe, dikeve Zaningeha Ege, beşa civaknasiyê û piştî çend salan zaningehê diqedîne. Nêzîkî pazdeh sal in hewl dide da ku di hindek warên zanistî û felsefî de bixebite.Heta niha gelek gotarên wî ên zanistî û felsefî di kovarên wek Kovara W, Felsefevan, Xwenas, Tîroj û Ajda de hatine çapkirin. Niha li Tirkiyeyê dijî, mamostetiya beşa felsefeyê dike û bavê du zaroka ye. Xwedî û berpirsiyarê malpera felsefeyê ya www.felsefevan.org ê xwedî û edîtorê Kovara Felsefevan e.*

*Berhemên wî yên ku heta niha hatine weşandin.*

***1-** Dengê Felsefeyê - Weşanên Doz - Rêbendan 2006*

***2-** Rewîtiyeke Zanistî - Weşanên Doz - Gulan 2007*

***3-** Jiyan û Felsefeya Mensûrê Hallac 'Enel Heq'-Weşanên Evrensel. Stenbol 2015*

***4-** Destpêka Felsefeyê- Weşanên Soran- 2015*

***5-** Antolojiya Feylesofan I. Weşanên Soran. Çapa yekem.2015.*

## 1- Ramana Xwedê di Teoriya <Made û Formê> ya Arîstotales de

Çawa ku teoriya ***<îdeayan>*** ya Platon, navenda giştî ya felsefeya wî be, teoriya Arîsto *(Arîstotales)* ya ***<Made û Formê>*** jî, mirov dikare bibêje ku navenda felsefeya wî ye. Di teoriya xwe ya ***<Made û Formê>*** de Arîstotales, rexne li teoriya ***<îdeayan>*** ya mamosteyê xwe Platon digre. Arîstotales dibêje, îdeayên Platon ji cîhana madî cihê ne û jê dûr in û ji bo ravekirin *(şirovekirina)* cîhana madî jî, bêhêz in. Ji ber vê çendê jî, rexne li teoriya Platon girtiye. Li gor baweriya Arîstotales jî, îdea çawa ku Platon dibêje; ne li derveyê nesneya ne û ne jî li derveyê demê û war in. Îdea, hilika hemû heyîna ne û di nava wan de ne. Nesneyên ku em wan bi saya sehekên xwe dinasin, bi temamî xwediyê hilikeke hevpar in *(lewnek, formeke xwe hene)* û ev xala wan ya hevpar, nûneritiya yekîtiya wan dike. Ango yekîtiya wan temsîl dike.

Form *(lewn),* şekl dide madeyê û ya ku em wê yeko yeko di hemû heyînan de dibînin jî, ew form bi xwe ye. Di vê xalê de tê dîtin ku Arîstoteles ji bo pirsgirêkên *(hişkegirêkên)* mîna yekîtî, pirranî, naguhêrbarî û çêbûnê, rêyeka nû ya çareseriyê peyda kiriye. Made, derfet *(îmkan)* û dibetiyek e, wekê hêzekî ye û ya ku dê bigihêje şeklekê ye. Form, wê madeyê digihêjîne şeklekê *(şeklekê dide madeyê)* û wiha dike ku ew dibe tiştekê li holê ya bilewn û rasteqîn. Made di destpêkê de ne nesneyeke diyar *(kifşkirî)* e, hê ne bûye *<ew>* yan jî *<ev>* nesne. Çimku hê wê demê bi sînor e û hê nebûye heyîneke misoger.

Ji bo hemû heyînên di gerdûnê de jî, em dikarin vê yekê bibêjin. Arîstoteles gerdûnê, ji hêla made û formê ve wek

giştek qedemebûyî dibîne. Heyîna ku li dereceyeka jêrîn e, ji bo heyînekê ku li jora wê ye *(raserê wê ye)*, <*made*> ye. Lê ji bo heyîna ku di binê *(jêra)* wê de ye, form e. Mesela keresteyên înşaatê li gor xanîyekî, made ye û xanî, forma wê ye. Lê li gor darê, keresteyên înşaatê form e. Di binê herî kûr ya vê qedemebûnê de, madeya yekemîn ya ku bi temamî bêform e, heye. Di cîhê herî bilind ya vê qedemebûnê de jî, ***<forma zelal>*** heye. <*Forma zelal*> ne hewcedarê madeyê ye. Ev bi xwe nalive *(tevnagere),* lê ya ku madeyê dilivîne, <*forma zelal*> e. Têgeha <*forma zelal*> ya Arîstotales, dişibe ***<nousa>*** yan jî ***<qenc ê/a herî gewre>*** ya Platon. Bi gotineke din ramana ***<forma zelal>*** ji bilî ***Xwedê*** ne ti tişt e.

## 2- Hunera Danwelidandinê

Sokrates wiha bawer kiriye ku nirxên me yên exlaqî yên weke başî, xirabî û erdem, li gor mirov û civakan nayên guherîn. Heke mirov hewl bidin, ew dikarin bi rêbazên aqlî xwe bigihînin wan zanayiyan û jiyana xwe jî, li gor wê yekê bidomînin. Wezîfeya *(erka)* fîlozof jî ew bû ku bi rêya guman, înkar, rexne û lêkolînê, gihêjtina zanayiya têgehên weke <*başî*>, <*xirabî*>, <*edaletê*> û nasandina wan têgehan bû. Dîsa wiha bawer kiriye ku ev zanayî di rih û mejiyê mirovan de, ji destpêkê *(zayînê)* ve hene. Û Ya girîng jî, derxistina holê yan jî bibîrxistina wan zanayiya ye. Lê ji bo ku mirov bikaribin wan zanayiyan bînin hişê xwe, divabû mirovan alîkariya wan bikira. Sokrates, ji bo peyîtandina vê teoriya xwe, di vê mijarê de

alîkariya mirovan kiriye û navê vê rêbaza xwe jî daniye **<*hunera danwelidandinê.*>**

Ji bo pêkhatina vê yekê jî, bi mirovan re sohbetê kiriye û ketiye guftegoyan. Di destpêkê de Sokrates her gotiye ku ez bi tiştekê nizanim û wisa dest bi guftegoyê kiriye. Lê di dawiya sohbetê de, bi wan mirovan daye zanîn ku zanyariyên wan çewt yan jî kêm in.

## 3- Eudaimonistiya *(Bextewarîperestiya)* Sokrates

Sokrates wiha bawer kiriye ku ehlaqdarî (erdemdarî), zanyarî ye û mirovê zanyar ew mirov e ku jiyaneka bextewar dijî. Dibe ku ev nêrîna wî, di destpêkê de ji bo me mîna nêrîneke ecêb were.

Belam Sokrates vê nêrînê parastiye û li gor baweriya wî, mirovên ku bextewar dijîn ew di heman demê de mirovên xwedîerdem in jî. Navê vê nêrîna (dilêrîna) ehlaqî **<Bextewarîperestî- Eudaimonism>** e.

## 4- Berhemên Wêjeyî û Felsefe

Berhemên wêjeyî yên baş, ji bo felsefeye derfet *(îmkanên)* baş diafirînin. Zarokên ku berhemên edebî dixwînin, xweş têdigihêjine tehma xwendin û fikirînê. Aso û hizra wan, berfireh dibe û dest bi pirsen xwe yên xwezayî dikin. Guman tê de nîne ku destpêka *(daketina)* pirsîna pirsan, wan ber bi aliyê felsefeye ve dahf dide. Lew re, xwendin pêdiviyek sereke û jêneger e. Lewma jî, zarokên ku ji berhemên edebî baş ditehmijin; pirraniya

wan bere xwe didin wêje, huner, zanist, û felsefeyê. Di encamê de wê behredariya ku bi rêya xwendine zeft dikin, ew di seranserê jiyana wan de rênîşandêriya wan dike û ew bi xwe jî dibin kesayetiyên afirandêr.

## 5- Binyada Felsefeya Yewnaniyan

Binyada felsefeya yewnaniyan, felsefeya *(erdnîgeriya)* kurda ye. *(Ramana dualîtî ye, nûzayîn û baldariya xwezayê û hwd.)* Anku yewnaniyan xaniyê xwe, li ser xîmê ku kurdan wan daniye ava kirine. Lê yewnaniyan ramanên ku ji Mesopotamyayê bar kirine welatê xwe, wan bi awa û rêbazên mantiqî û rexnegir, baş sîstematize kirine. Binyada *(çavkaniya)* felsefeya rojavayê jî, felsefeya yewnana kevnare ye. Lê rojavayiyan wisa ne rasterast, lê bi saya *(rêya)* wergerên erebî felsefeya yewnaniyan naskirine.

Mesela rojavayî, ji Farabî re dibêjin mamosteyê duyem. Mamosteyê yekem Arîstotales e, lê ji ber ku wan Arîstotales bi saya berhemên Farabî naskirine, navekî wiha lêkirine. Lewma jî, di destpêkê de naskirina felsefeya yewnan û rojavayê girîng e, di pêşveçûna medeniyeta cîhanê de jî xwediyê roleka mezin in. Û lewma jî nabe ku em felsefeya wan biçûk bikin û bibêjin ku <*gotinên beradayî ne.*>

## 6- Bingeha Felsefeya Platon

Platon gotiye ku du cîhan hene: Cîhana îdeayan û ya xwiyakirî, ango cîhana qelp. Hemû heyînên ku li dinyayê hene, ew qopiyên heyînên resenî/îdeaya ne, hêz û hebûnatiya xwe jî, ji wan digrin. Lewma jî, cîhana resen û mayende, cîhana îdeaya ye. Heyînên ku di cîhana îdeayan de cih digrin, naguherin, mirin ji wan re tune û ji holê re ranabin. Ango, eternal in. Ev dîtina wî ya xweser, çavkaniya *(binyada)* hemû felsefeya wî ye. Ango, hemû felsefeya xwe, li ser vê ramana xwe ya xweser ava kiriye.

***Mesela wiha gotiye:***

** Tevgera herî baş ya ehlaqî ew e ku ber bi* ***<îdeaya baş>*** *ve diqeside.* ***(Felsefeya wî ya Ehlaqê)***

** Heyînên rasteqîn, îdea ne û yên ku li dinyayê xwiya dikin jî, qopî/qelp in.* ***(Felsefeya wî ya Heyînê)***

** Şagird beriya hemû tiştan, bi rêbazên/awayên diyalektîkî divê îdeayan fêr bibin.* ***(Felsefeya wî ya Perwerdehiyê)***

** Huner, texlîdkirina texlîda ye. Lew re, cîhana der texlîd e û hunermend jî, texlîdan texlîd dike. (Felsefeya wî ya Hunerê)*

** Zanayiya rast, zanayiya îdeaya ye.* ***(Felsefeya wî ya Zanayiyê)*** *û hwd.*

Ev nêrîna wî ya xweser ya du cîhanan û ramanên mamosteyê wî Sokrates, ku berê asîmanan nîşan dabû û gotibû ku <*jiyana me ya esasî/resenî li wir e.*> wekî mizginiya olên yekxwedayî hatine/têne qebûlkirin.

## 7- Rojavahî û Felsefe

Rojavahiyan piştî ku pirsgirêkên xwe yên rojane safî kirine, xwe berdane cîhana pirsên tevahî yên nedîtbar. Bêguman têkiliya vê yekê bi amizgeriya pêrgalê û bi azadiya ramanê re jî heye. Her wiha bi pêşketina zimên re jî. Li rojhilat jî, ji bo fîlozofan babeta sereke ***'têkiliya Xwedê û mirovan'*** bû. Pirsên wekî ***'Em çawa dikarin bigihêjine Xwedê? Gelo em dikarin bi Xwedê bizanibin an na?'*** cîhekî mezin dagirtine û fîlozof, di kirasekî bi vî rengî ê teng de asê mane. Ev yek jî bûye tesewuf. Ango, felsefeya îslamê. Dema ku felsefeya rojava wekî ava çemekî ber bi asoyên nenas ve herikiye, felsefeya îslamê di koşeyên teng de asê maye û bûye felsefeyeke qemirî û sekinî. Em dikarin bibêjin ku di felsefeya rojava de navend her dem mirov e *(piştî felsefeya serdema navîn)* lê di felsefeya îslamê de, Xwedê navenda her tiştî ye. Mirovî li rojava her tişt e, lê li rojhilat per û baskên mirovî hatine şikênandin.

## 8- Felsefeya Kurdan a Aştîxwaz

Felsefeya kurdan felsefeyeke aştîxwaz, mirovhez û xwezaperest e. Ligel vê yekê, felsefeyek serhildêr e jî û tu caran, niheqiyan jî nepejirandiye. Xweşdîtin û toleransa di çanda kurdan de, her dem hebûna xwe berdewam kiriye û heta xwe gihandiye roja me ya îroyîn. Wekî gel û netewe, tu caran xwe raserî gel û neteweyên din nedîtiye. Rêz û hurmeta xwe ya li hemberî çandên cîranan, wenda nekiriye. Di nêrîna kurdan ya felsefîk de, yekser lewitandina jiyana me ya li vê dinyayê tune, xebat û xîretiya takekesî û civakî, her dem girîng hatiye dîtin.

Çavkaniyên van ramanên min, helwest û sekna pêşiyên kurdan, tevgerên bav û kalên me û berhemên helbestvan, nivîskar, ramanwer û fîlozofên kurda ne. Lewma jî di erdnîgeriya kurdan de, her dem xweşdîtin û aramî serwer bûye û çend bûyerên neyînî ku hatine dîtin jî, çavkaniya wan ne çanda me kurda ye. Hebûna çanda kurdan, îro ji bo pirraniya erdnîgeriya Rojhilata Navîn dewlemendiyek e û divê jê sûd were girtin.

## 9- Axaftin û Nivîsandina Bi Zimanê Kurdî

Axaftin û nivîsandina bi zimanê kurdî, ne tenê navgîna lihevkirina jiyanî ye. Hezkirina xak, dîrok û çanda neteweyeke ye. Bêrîkirin e, hest e, wujdan e û heta mirov dikare bibêje ku sekneke ehlaqî ye. Herweha, serînetewandin û lidijderketina asimilasyona dagirkeriyê ye. Pûçkirina îdeolojiya fermî ye.

## 10- Di Felsefeya Marksîst de Bandûra Felsefeya Xwezayê ya Hegel

Di ramanên Hegel de xweza, îdeyek e ***(heyîna teqez e)*** ku ji xwe der çûye û cihêreng bûye. Têgeha îdeyê ku têgehek razber *(nedîtbar) (soyut)* û cihêreng e, yeko yeko vediguhere heyînan, ango dibe heyîn û bi vî awayî jî dibe heyînek, dibe heyînek ji derveyê xwe. Ji ber vê çendê jî yekîtiya îdeyê, di xwezayê de bi awayekî eşkere xwiya nabe, xwe vedişêre û nûxamtî ye, lewma jî em di xwezayê de piraniyê dibînin. Herweha heyînên yeko yeko yên ku

di xwezayê de hene; hebûna xwe ji xwe wernagirin, ji îdeyê werdigirin û bi îdeyê re jî bi temamî ne guncan in, di navbera wan de lihevhatinek berbiçav jî tune. Jiber vê yekê jî, di xwezayê de herdem dibetiyek li ser kar e.

Derketina derêxwe ya îdeyê ku dibe bîyaniyê xwe, di xwezayê de tê dîtin. Heyîna teqez *(heyîna mitleq)* ji bilî xwe, li derveyê xwe dibe heyînek û dibe biyaniyê xwe. Di ramanên Hegel de bingeha ramana bîyanîbûnê, ku piştra di felsefeya Marksîst de bûye xwediyê cîhekî girîng, ji vê niqteyê tê. Serê binî yê xwezayê ew îde ye ku bi temamî bûye biyaniyê xwe û wisa jî, xwe daye der.

Serê jor *(raser)* jî nîjada mirov e ku xwedîaqil e û têdigihêje hişmendiya xwe. Nijada mirovî jî; di xwezayê de dertê holê, û di xwezayê de dibe heyîn. Lê nîjada mirovî hêdî hêdî xwe ji xwezayê dûr dike, digihêje bîra *(hişê)* xwe, ber bi îdeyê ve *(heyîna mitleq)* ve diqeside, têdigihêjê û bi vî awayî, ew bîyanîbûn û xwe xerîbdîtin, ji holê radibe. Careke din, digihêje yekîtiyê.

Ango yekîtiya teqez; di ramanên mirovî de carekê din tê têgihiştin, ji nû ve tê raxistin. Bi vegotineke din xweza, kedeka mezin e û dixwaze ku bigihêje bîra xwe û koka xwe binase. Herweha armanca felsefeya xwezayê jî, şirovekirin û destnîşankirina vê berfirehbûnê ye ku gav bi gav pêk tê.

## 11- Xweseriya Dînê Êzdayetiyê

Dînê *(ola)* êzdayetiyê, dînekî eklektik *(bijarteker)* nîne û dînekî xweser e. Mixabin, têgihiştineke çewt a bi vî rengî

berbelav e û wiha tê fikirîn ku êzdayetî baweriyek bijarteker e. Lê ev nêrîn *(dilêrîn)* ne rast e, bawerî û dînê êzdayetiyê jî dike mîna dînekî *(oleke)* pînekirî. Di dînê êzdayetiyê de xweşdîtin, hezkirina ji xwezayê û mirovan, hesta tolerans û empatiye heye. Herweha hêvî û duayan bawermendên êzdî, ji bo *72* miletên cîhanê û temamiya mirovahiyê ne. Lê ev rûmet û hezkirina ku ji bo bawerî û kulturên cihêreng tê girtin, mixabin rê li têgihiştineke çewt a bi vî rengî vedike.

## 12- Derketina Holê ya Zanayiyê

Zanayî, hilberek e û di encama têkiliya kirde û wanekê *(ozne/nesne)* de dertê holê. Ji bo derketina holê ya zanayiyê, pêwîst e ku kirde bi armanca zanîn û fêrbûnê, ber bi wanekê ve biqeside. Di encama vê helwestê de kirde, wanekê ji xwe re dike babet/mijar û li ser wanekê difikire.

Di encama vê çalakiya zêhnî de, bi awayê razberkirinê *(soyutlamayê)* hindek têgeh têne bidest xistin. Piştra, di navbera van têgehan de kirde xwe digihîne hindek torên têkiliyan û ev yek, bi pêşniyaran tê derbirîn û bi riya birêvebirina aqil re jî, deranên *(çikarimên)* eşkere/diyar têne bidestxistin. Zanayî, di encama vê pêvajoyê de tê bidestxistin.

Wek mînak: Ji bo ku em bikaribin bibêjin kevirek kevir e, pêdiviya me bi têgehên wekî giranî, reng, bareste, şekil û hwd. heye. Herweha pêdivîya me bi hindek girêdanên

(hevokên) wekî *'Kevir, madeyeke hişk e.', 'Kevir, xwediyê baresteyekê ye.'* û hwd. jî heye.

Di encama van pêşnîyarên ku taybetmendiyên wanekên cihêreng vedibêjin de, em xwe digihînin derana *(encama) 'Kevir cismek hişk e, xwediyê giranî û rengekê ye, bişekil e û di fezayê de xwediyê baresteyekê ye.'* Di vê xalê de, em êdî dikarin bibêjin ku ji bo pirsa kevir çi ye, bersiveka me heye.

Ê baş e, ka em di vê xalê de li ser derana ku me bi dest xistiye carekê din bifikirin. Ji bo kurtedemekê be jî, em li ser wê derana *(encama)* ku di derheqê kevir de bi dest xistiye bikevin gumanê *(şikê). (Divê em tu caran ji bîr nekin ku ketina şikê/gumanê jî, çalakiyeke zêhnî ye.)*

Di rewşeka wiha de, li ber çavê me rastiya wê deranê/encamê dê kêm bibe. Di vê xalê de li hember wê gumanê, em ê bibêjin ku 'em ji wê deran/encamê bawer dikin.'

Hasilê, zanîna tiştekê, pêbaweriyê jî diguncîne. Belam, di vê xalê de jî em hê nikarin bibêjin ku zanayiya ku me bidest xistiye; bi rastî jî zanayiyek e. Lewra, dibe ku em rastê kevirek din yeka ku li danasîna me ya 'kevir' neyê werin. Wê demê, dê ev zanayiya ku me bi dest xistiye, dê 'çewt' be. Axirê, em dikarin bibêjin ku wê zanayî di rewşeka wiha de derkeve holê ku wê em ê nikaribin ji bo çewtderxistina wê tu çavdêriyan pêk bînin.

***Ji deran/encamekî re ji bo ku em bikaribin bibêjin ew zanayî ye, çend şert peywîst in. Yên wekî:***

**1-** *Pêwîst e ew çalakiyek zêhnî be.*

***2-*** *Divê hilbereka ku di encama wê fikirînê/çalakiya zêhnî de hatibe bidestxistin be.*

***3-*** *Divê baweriyeka me pê hebe.*

***4-*** *Ji bo çewtderxistina wê, divê tu çavdêrî nikaribin werin çêkirin.*

## 13- Dijberiya Rasyonalîzmê a John Locke

Beriya her tiştî, John Locke ramana Descartesî ya îdeyê ji bo ramanên xwe weke bingehekê hilbijartiye, ku îde tê wateya hemû tiştên ku mirov li ser difikire. Descartesî wiha pêbawer bû ku mirovî ji zayîna xwe ve xwediyê van îdeya ye. Belam John Lockê ezmûnger, bi temamî li dijê vê ramanê derketiye û vê angaştê qebûl nekiriye. Li gor bîr û baweriya John Lock jî, mirov ti tiştan *(îde, raman yan jî têgeh)* ji zayîna xwe ve nayne. Belam, di destpêka jiyanê de zêhn, bi rêya têgîhan û fikirînê, zanayiyan bidest dixe.

***Li gor felsefeya John Locke***

***1-*** *John Locke di navbera îde û azmayişê de, têkiliyeka dualî ava dike.*

***Têkiliya Yekemîn:*** *Zêhna mirovî, di destpêkê de weke Lewheyeke Vale (Tabula Rasa) dest pê dike û her diçe (bi berfirehbûnê re) îdeyan bidest dixe.*

***Têkiliya Duyemîn:*** *Hemû tiştên ku em pê dizanin ji azmayîşan/serboriyan têtin. Ji bo ku em bikaribin tiştekî weke zanayî bipejirînin, beriya her tiştan divê sedemên ku ji azmayîşên me têtin, hebin. Herweha divê teoriyên me yên*

*zanistî jî ji bidestxistin/birêvebirinên aqlî yên razber zêdetir, ji azamayîşan werin û divê ku xwe bispêrin azmayîşan.*

***2-*** *Azmayîş, ji aliyê John Locke ve wekî du beşan hatiye bikaranîn. Li aliyekî ezmûna derveyî, ku xwe dispêre pênc livokên me yên sehekî. Li aliyê din jî ezmûna hundûrîn heye, ku di vê yekê de jî îdeyên ku bi riya ezmûna devreyî têne bidestxistin, têne bikaranîn.*

Li gor bîr û baweriya ***John Locke***, hemû zanayiyên me bi riya pênc livokên me yên sehekî têne dîtin û bi rêya ezmûna derveyî jî têne bidestxistin. Piştra, ev daneyên ku bi riya sehekan têne bidesxistin *(ku ev pêşnîyarên sade/basîd in yên wekî zer, dirêj û tirş in û ku wesfên yekemîn in)* li hevdu têne girêdan û bi vî awayî jî îdeyên tevlîhev têne hilberandin.

***3-*** *Herweha, Joh Locke îdeyan jî dike du beşan:*

***A-*** *îdeyên sade/basîd*

***B-*** *Îdeyên tevlîhev/kompleks*

*Îdeyên tevlîhev, mirovî dikare bibêje ku bi riya hevûdûdana îdeyên basîd têne hilberandin. Îdeyên basîd jî, bi riya bandora nesneyan ku li ser sehekên me dihêlin, têne hilberandin. Îdeyên sade/basîd gellekî vekirî ne, lê îdeyên tevlîhev gellekî berfireh (bergehdar) in.*

*Mesela em derheqê nesneyekê de dibêjin ku ew zer e, tirş e, mezin e û hwd û em van têgehan, digihînin leymon û rojê jî. Bi vî awayî jî em dibêjin ku: 'Leymon tirş e, an jî tîrêjên rojê zer in.' Û bi dereneke bi vî rengî em xwe digihînin îdeyên kompleks/tevlîhev.*

***4-*** *John Locke li gor taybetmendiyên wan, dibêje îdeyên sade/basîd xwediyê du wesfên cuda ne.*

*__A-__ Wesfên bingehîn/sereke: weke hejmar, şekil û tevger in.*
*__B-__ Wesfên talî (di rêza duyem de): wekî deng, reng û têhm in.*
*Wesfên bingehîn, ji nesneyan têtin û hege ew tunebin, em nikarin têbigihêjin wan. Wek tirşbûna leymonê, ku em nikarin îdeya tirşbûnê ji îdeya leymonê cuda bikin. Wesfên talî jî, li gor yê/ya ku têdigihêjê diguhere. Mesela leymon di heman demê de zer e jî, lê li gor ronahiyê dikare bi rengekî cihêreng jî were têgihiştin.*
*__5-__ John Locek wiha difikire ku nesne têne gihîştin. Têgihîştin jî, bi bandora wesfên nesneyan yên bingehîn û talî ku li me dikin, pêk tê. Îdeyên ku ji nesneyan têne têgihîştin, xwediyê wê hêze ne ku di zêhna mirovî de nesneyan temsîl bikin. Bi vî awayî îdeyên ku di zêhna me de hene, amizgerê nesneyên xwe ne û nûnerên wan in.*
*__6-__ Pejirandin an nepejirandina îdeyan, amizgeriya wan yan jî neamizgerîya wan, zanayiyê derdixe holê.*
*__7-__ John Lockî dibêje ku çar hêmanên ku zanayiyê derdixin holê hene…*
*__1- Jevbûn:__ Cihêkirina/veqetandina heyînekê ji heyînekê din û raxistina cihêrengiya wê ya holê. Mesela em dikarin bibêjin ku 'dar' eynî weke xwe ye û ji 'hesin' cihêreng e.*
*__2- Tekilî :__ Diyarkirina têkiliya di navbera du heyînan de. Mesela wek diyarkirina têkiliya di navbera sêkoşe û çarkoşe de.*
*__3- Girêdana bivênevê û hebûna bi hevdu re:__ Ji bo pêkhatina îdeyeke tevlîhev, pêdivî bi gellek îdeyên sade/basîd heye. Mesela îdeya televîzyonê. Em dizanin ku îdeya televîzyon ji gelek îdeyên biçûk pêk tê, lê ew hemû bi hevdû re îdeya televîzyonê pêk tînin.*

***4- Hebûna rasteqînî:*** *Divê îdeyek bi rastî jî nesneyekê ku heye, temsîl bike. Mesela dema em behsa darê bikin, divê ev têgeh di xwezayê de temsîla darê bike.*

## 14- Mentîqa Sedemîtiyê û Davîd Hume

Di guherîna mentîqa sedemîtiyê *(determînîzmê)* de, rolê ezmûngerê îngilîz Davîd Hume î gelekî girîng e û Hume, bi şikberiya xwe *(bi helwesta xwe ya şikber, gumankar)* navdar bûye. Davîd Hume, xebatên Newtonî ji xwe re wekî mînak hilbijatiye û bi helwesta xwe ya şikber, bandûreke mezin li fîlozofan kiriye.

Di destpêkê de xebatên wî, axlebî li ser rêbaza xebitîna mejiyê mirovî bûn û wiha dixwest ku prensîbên xebîtîna mejiyê mirovî destnîşan bike. Di babeta felsefeya zanayiyê de lêzêdekirina herî mezin ya Davîd Hume, dahûrandina *(analîzkirin, dewiyandin)* wî ya li ser sedemîtiyê ye. Davîd Hume di babetên zanayî û zanistî de, têgihêjê ku ramana sedemîtiyê gelekî girîng e û xwediyê roleka bingehîn e û bi şik, nêzîkê vê yekê bûye.

Lewra li gor bîr û baweriya Hume, ramana sedemîtiyê, di navbera du bûyeran de girêdanek e û ev girêdanî, bi temamî, ji hînbûnîyên me têtin. Lewra dema ku em di navbera du bûyerên ku li pey hevdu tên de girêdanek pêk bînin û em bûyera yekemîn, weke sedemê ya duyemîn bihesibînin; sedemê vê yekê, bêguman hînbûnî û azmayîşên me ne.

Ango li gor baweriya Hume, em di navbera du bûyeran de ku li pey hev têtin; girêdaniyeke sedemîtiyê ava dikin.

Wek mînak: Her sibê roj hiltê û êvaran jî diçe ava. Herweha piştî rojê jî, şev tê. Ev yek wiha dike ku em di navbera wan de *(di navbera du bûyeran de)* têkîliyeke sedemîtiyê ava dikin. Lê bingeha sedemîtiya di vir de, bi temamî psîkolojîk e, ji azmayîşên me pêk tê û tiştekî ku dotira rojê jî, vê bûyerê sewgiran *(garantî- temînat)* bike tune. Ev yek bi temamî encameka hînbûnî û hêviyên me ne. Herweha, hinek caran jî sedemê ramana *(fikrê)* sedemîtiyê, rêbaza enduksiyonê ye.

## 15- Di Felsefeya Yewnan de Rola Mîtolojiyê

Mirovan, di destpêkê de hemû bûyer û kirûyên xwezayê, bi mîtolojiyê şirove kirine, ku mirov dikare vê astê weke ya yekem bihesibîne. Piştra, şiroveyên olî tên û piştî şiroveyên dînî/olî jî, ramana felsefî dest pê dike û dûvre jî, ramana zanistî. Lewma jî, bandûra mîtolojiyê li ser felsefeyê gelekî zêdeye û xwediyê roleka mezin e. Bêguman ramanên felsefîk ji ramanên mîtolojîk derketine, lê çawa gelo?

Li ser vê mijarê, em dikarin civaka yewnana antîk, weke mînakeke xweser pêşkêş bikin. Dema mirov bala xwe baş dide civaka grekiyan, mirov dibîne ku Xweda û Xwedawendên grekiyan dişibiyan mirovan û grekî, di pergaleke wiha de dijiyan. Ew Xweda û Xwedawend, bêmirin/zindebar bûn, lê gelek taybetmendiyên wan, dişibiyan yên mirovan. Mesela şer dikirin, dihezidiyan, xirabiyê li xelkê dikirin û heta carinan bi mirovan re diketine têkiliyên cihêreng jî. Piştra di navbera ramanên xwe yên daringî û arîşî <*madî û manewî*> yan olî de, cûdatiyeke ava kirine û piştî vê cihêkirinê jî, kulturê dest

pê kiriye. Ev niqte, xwesteka serweriya xwezayê bi xwe re tîne. Lewra, di mîtolojiya grekan de di destpêkê de kaos *(sehm)* heye û wisa bawer dikin ku gerdûn, di nava tevlîheviyekê de ye û her tişt, ji hev cihê nebûye. Ji vê telîhiviyê, gerdûneka birêzik dertê û jêre 'cosmos' tê gotin. Li gorî nêrîna grekiyan, hêza îlahî gerdûnê ji vê tevlîheviyê rizgar kiriye û piştra, gerdûn bûye avahiyeka birêzik/rêkûpêk. Ji wê hêza îlahî re jî gotine **<*Demîurgas*>.** Piştra, bîr û baweriya xwe bi Xwedayên Zeusî û bi Xwedayên din jî anîne. Di vê babetê de niqteyeka din: Tiştê ku li welatê wan diqewime yan tê serê wan û kar û barên wan yên dinyayî, bi zagonan hatine kargerandin û rola wan zagonan jî, di pêşveçûna civakê de pirr girîng e.

## 16- Di Felsefeyê de Rêbaza Diyalektîk

Diyalektîk, riyeka fikirînê ye. Bi vê rêyê, yên nakok yan jî dijber, têne cem hevdu û yekîtiyeke diafirînin/pêk tînin. Di encama vê yekê de jî, pêşveçûnek dertê holê. Cara yekemîn, mirov dikare bibêje ku li cem ***Herakleîtos*** hatiye dîtin û di dewra hemdem de jî, ji aliyê Hegel ve hatiye bikaranîn.

Di diyalektîkê de du têgehên dijber, tez û antîtezê pêk tînin û ev du dijber, digihêjin sentezê. Sentez jî, piştra carekê din ji hev dabeş dibe û dibe tez û antîtezeke din yên nû û ev pêvajo, her wusa berdewam dike. Mesela: Reş *(tez)* û spî *(antîtez)* bila du têgehên dijber bin. Wê senteza wan, cûn *(grî-boz)* be.

## 17- Zenonê Eleayî (B.Z.490-430) Çima Tevgerê (Liv, Bizav) Napejirîne?

Di felsefeya Zenon de, tevger nayê pejirandin û weke şaşî *(xap)* û xwiyakirinekê tê dîtin. Di dîroka felsefeyê de ev nêrîna wî, bi navê ***<Paradoksa Tevgerê>*** hatiye nasîn. Lew re Zenon dibêje ku cosmîk, di ser riya xwe de divê ku ewilî nîvê riya xwe biqedîne/temam bike. Lê li pêşiya cosmîkê, nîvê rê dîsa dimîne û divê ku ew nîvê riya xwe ya mayî jî biqedîne. Belam, ew çixa here bila here, dê nîvê riya cosmîkê dîsa jî bimîne. Ev pêvajo, *(maweya ku dê biqedîne)* heya dawî bi pêş ve diçe û herdem, nîvê rêya cosmîkê dîsa jî dimîne. Ji ber vê yekê: cisîmek *(cosmîkek)* ji niqteyekî nikare here ya dinê. Lewra, ew ti caran nagihêje wê niqteya dawî. Di vê niqteyê de cîh *(war)* ji hevdu heta dawî vediqete *(cihê)* dibe û jihevçûn, tevgerê pûç dike. lew re li gorî felsefeya Zenon: ***<Boşî û tevger, ne rasteqîn in.>***

Gelo, Zenon di vê pêşniyarê de dixwaze çi bibêje? Ew wan tiştên ku em wan bi alikariya sehekan dinasin, wan înkar dike yan na? Bêguman, wan înkar nake. Lê wiha dibêje: 'Bingeha cîhana sehekan, tevger û boşî ne. Dibe ku cîhaneka sehekan hebe, lê ew cîhan ne rasteqîn e.'

Zenon, sehekan înkar nake, lê dibêje ku ew ne rasteqîn in û vê yekê qebûl nake. Li gorî felsefeya Zenon: Tevger û boşî, hene. Lê ew bi alikariya sehekan hene û lê tu realîteya *(rasteqiniya)* wan tune. Ew bi tenê xwiyakirin in û rasteqîniya tiştan jî, di naveroka wan xwiyakirinan de ye.

Di vê niqteyê de: Di navbera xwiyakirin û rasteqîniyê de cudatiyek xwiya dike, ku Zenon vê yekê wiha şirove dike: *'Objeyên/nesneyên ku li hawirdor in, xwediyê bûyîn û heyînekê ne. Belam, ew ne di xwede ne.'* Ango, cewherê *(substance)*

wan, ne di wan de ye. Ew cewher, ji tiştekê din tê ku ew jî, heqîqeta heyînê ye. Bi gotineke din meriv dikare wiha jî şirove bike: Di cîhana sehekan de obje *(nesne)* hene. Belam, ew ne xwediyê hebûnatiyeke serbixwe ne. Bi tenê, xwiyakirinên heyînên rasteqîn in. Ji xwe înkara sehekan jî, ji vê xalê *(niqteyê)* dihat.

## 18- Felsefeya I. Kant ya Ehlaqê

Feylesofê ku armanca tevgerên me yên ehlaqî wekî wezîfeyekî *(erk, vatinî, peywir)* dibîne, I. Kant e. Kant wiha pêbawer e ku tevgera ji vatiniyê tê, tevgera rast e. Dîsa dibêje ku di gerdûnê de û li derveyî gerdûnê, tiştek tenê heye ku em dikarin wê bi baş binavînin. Ev tişt jî vatinî *(wezîfe, erk, peywir)* ye, xwestina/daxwaza ***'baş'*** e. Lewma jî, armanca tevgerên me yên ehlaqî, ne bextewarî ye. Çimku bextewarî, li gor mirovan diguhere *(guhêrbar)* e.

***Kant wiha dibêje:*** *'wiha tevbigere ku ev tevgera te, ji bo hemû mirovan bila bibe zagonek û tevgerîna li gor vê zagonê jî, bila bibe vatiniya/wezîfeya hemû mirovan.'*

Di vê xalê de mirov dikare bibê je ku I. Kant, ji zagona ehlaqê ya ***subjektîv/kirdewar*** dest pê kiriye û xwe gihandiye zagoneka ehlaqê ya ***objektîv/neterefgir.***

## 19- Etîka Olî

Di ehlaqê *(etîka)* olî de ji ber ku lêferzkirin û zordariyek heye, keyfa min zêde ji wê ehlaqê re naye û ez wê qebûl nakim. Di cibicîanîna wê de jî, bêguman tirsa afirander heye û xelatên pîroz hene. Di pirtûkên pîroz de wekê baş yan jî xirab destnîşankirina tevgerên mirovî, ne karekî mirovî û komelî ye. Tenê fermanek e û li dijî wê fermanê

stûxwarkirin, encamek bivênevê ye. Ji ber ku ew fermaneke pîroz e, dibe fermaneke naguhêr jî.

Li gor fermanan cibicîanîna wê ehlaqê jî, bivênevê dibe wezîfeyeka xwezayî ya bawermendên oldar. Ango, hin kes dertên û bi destekarî, dixwazin ku yên baş û xirab nîşanî mirovan bidin. Dawiya wê yekê jî mixabin pêvçûn, kûştin, berberî, şîdet û tunekirina gelek nîrxên mirovî û civakî ye. Belam ehlaqê civakî, bêtir mirovî ye. Dikare xwe nû bike, nîrxên nû biafirîne û biryara rêbazên sepandina *(cibicîanîna)* wê jî, mirov bi xwe didin. Çavkaniya nasandina başî û xirabiyê ango nasandina ehlaqê civakî, mirov bi xwe ne û ev yek, bêtir çalakiyek mirovî û civakî ye.

## 20- Dewlemendiya Ziman

Zimanek dema ku di hemû şaxên zanistî û felsefî de neyê bikaranîn, mîna zimanekî folklorîk *(herêmî)* dimîne û dibe mîna zimanê rabirdûyê. Zimanê kurdî jî, heta ku di warên zanistî û felsefî de bi hişmendiyek mezin neyê bikaranîn, li ciyê xwe baş rûnayne û bi pêş nakeve. Ji bo pêkhatina vê yekê jî, pêdivî bi helwest û piştgiriyeka mezin heye.

## 21- Saziyên Civaka Sivîl

Civakên *(saziyên)* sivîl di civakekê de çuqasî bihêz bin, siberoja wê civakê jî hewqasî ronak e. Civakên hemdem, bi riya civakên *(saziyên)* sivîl, xwe baştir organîze dikin û dibin dengê gelê xwe. Herweha, civakên sivîl nîşana pêşveçûn û hemdemiyê ne jî. Ji ber vê çendê jî, li hemû

perçeyên Kurdistanê divê rê li ber saziyên sivîl neyê girtin û piştgiriya wan were kirin.

## 22- Huner û Pêşketin

Xalê me Nietzsche gotiye ku heke li welatekî, ji huner û edebiyatê zêdetir siyaset were axaftin, bizanibin ku ew welat, welateke ji cihana sêyemîn e. Tirkiye naxwaze ku **<*pirsgirêkên xwe*>** çareser bike û ne xwediyê wê berhevdanê ye.

Lewma jî axaftin û guftegoya sereke, siyaseteke rûkalkî û banegehî ye. Xwezî bi welatên cîhana sêyemîn, qe nebe ew rastiyên xwe qebûl dikin.

## 23- Zimanê Resenî

Zimanê resenî, ji bo mirovan cihana rasteqîn e. Kurdên ku bi zimanê xwe ê resen dijîn, dixwînin û difikirin, têgihiştiyên cihana resen in û di bin ronahiya cihana resen de ne. Lê Kurdên ku bi zimanê serdestan dijîn, dixwînin û difikirin, ew tene dîwarê şikeftê dibinin û wiha difikirin ku siyen li ser dîwêr, jiyan bi xwe ye. Herweha cîhana ku ew tê de ne jî, cihaneka qelp û demdemî ye.

## 24- Gelo Sokrates û Platon, du (2) Fîlozofên Fileh yên Beriya Hz. Îsa ne?

Di dadgehê de Sokrates tilîya xwe ber bi asîmanan ve ba dike û dibêje ku piştî mirinê, dê ez ê herim wir. Çimku cîhana mayende ew cîhan e û ez ê li wir bijîm. Piştra,

şagirtê wî Platon tê û teoriya xwe ya Îdeayê ava dike, ku bingeha vê teoriyê jî, ramanên Sokrates in. Platon dibêje du *(2)* dinya hene: Ya rasteqîn û ya qelp. Dinyaya ku em têde dijîn, dinya sehekî *(qelp)* e. Tê guherîn û nema weke xwe dimîne. Lê ya ku mayende û naguhêr e, cîhana îdeayê ye.

Dema ku Platon vê teoriya xwe ava kiriye, Îsa Mesîh hê nehatibû dinyayê. Lewma jî fîlozofên fileh yên pêşîn, hewl dane ku ramanên Platon û dazanînên filehtiyê lihev bînin û wisa bidin zanîn. Lewma jî piştî demekê, hinek fîlozofan ji Sokrates û Platon re gotine ku ew, du fîlozofên fileh yên beriya Hz. Îsa û mizgînberê filehtiyê ne.

## 25- Gelo Zerdeşt, Manî û Mazdek Pêxember in yan jî Feylesof?

Di bîr û raya kurdî de pirî caran Zerdeşt, Manî û Mazdek, mîna fîlozofan têne dîtin û tê gotin ku fîlozofê pêşîn, Zerdeşt bi xwe ye. Heke wiha be, wê demê divê em wan mîna pêxemberan nebînin û wesfên pîroziyê li kesayetiya wan bar nekin.

Felsefeya Yewnan û Rojavayê, gelek zanyariyên xwe yên felsefî, bêguman ji erdnîgeriya Mesopotamyayê wergirtiye. Lêbelê, zanayiyên ku hatine wergirtin, em dibînin ku bi hiş û aqilê mirovî hatine nirxandin û Yewnaniyan kirasekî mirovî li wan zanayiyan kirine. Lewma jî piştî felsefeya Yewnana Kevnare, xeteke sitûr ketiye navbera bawerî û zanayiyê *(aqil)* û ev xet, ji aliyê desthilatdarên felsefeya Rojavayê jî wiha hatiye pejirandin. Lewma tê gotin ku felsefe ne ji

Mesopotamyayê, belam li Yewnanistana Kevnare dest pê kiriye. Meseleya bingehîn, ev yek e. Nexwe tu kes, di warê ramana teorîk û felsefî de, rola Mesopotamyayê înkar nake. Li ser çêbûna gerdûn û dinyayê, li Hîndîstana Kevin jî metnên pîroz *(Upanîşad)* hebûne, lê ew jî wekî metnên felsefî ne hatine pejirandin. Çimku çavkaniya wan, ne aqilê mirovî ye û wekî ramanên afirendêran hatine ditin.

Lewma jî, ez dibêjim ku ne baş e ku em hemû tiştan ji xwe *(ji ax û neteweya xwe)* bidin destpêkandin. Helbet fîlozofên me yên qedirbilind jî hene û em bi wan, serbilind in. Nemir Ehmedê Xanî û Melayê Cizirî, du fîlzofên mezin yên dema xwe ne û axa Kurdistana Kevnare bi xwe jî, maka zanist û zanyariyê ya wê demê bû. Bi taybetî jî, keviyên çemên Dicle û Firatê.

## 26- Li Ser Zanayiya Olî Çend Gotin

Carinan wiha tê fikirîn ku zanayiya olî *(dînî)* zanayiyek nesnel *(neterefgir)* û naguhêr e. Helbet mirov dikare bibêje ku zanayiya olî zanayiyek naguhêr e, lê mirov nikare bibêje ku zanayiya olî zanayiyek nesnel e. Naguhêr e, çimku çavkaniya wê pîrozî ye. Ne nesnel e, çimku li gor bawermendên olên cuda, dikare were guherîn. Lewma jî zanayiya olî, dibe zanayiyek kirdewar *(takekesî)*.

Dîsa mirov dikare bibêje, ku zanayiya olî nikare were rexnekirin jî. Rexnekirina zanayiya olî, tê wateya ji rê derketinê û lewma jî, ji rexneyan re dadayî ye. Ev rewş, bi dogmatîzmê tê şirovekirin û di dawiyê de, zanayiya olî dibe zanayiyek dogmatîk/hişkbawer, naguhêr û kirdewar.

## 27- Biratiya Kurdan

Kurd, her car dibêjin ***'em birayên hev in.'*** Lê heke, a rast jî kurd ku birayê hevdu bin, divê ew birînên hevdu bibînin û êşa hevdu hîs bikin. Yan na, ev gotineke beradayî, pûç û bêqîmet e.

## 28- Felsefe û Zanyarî

Felsefe û zanyarî têgihiştin, hezkirin û pêşveçûn in. Lewma jî divê em bere xwe bidin felsefe û zanyariyê û bi awayekî baş jê sûdwerbigirin.

## 29- Evîna Platonîk

Gelo ma we dizanibû ku peyva ***<platonîk>,*** ji navê fîlozofê Platon tê û ji wir jî, ketiye zimanê tirkî. Bi zimanê fransî ***<Amour platonique>*** û bi zimanê latinî jî, ***<Amor platonicus>*** tê gotin. Evîndarên platonîk ew kes in ku ne bi evînek dinyevî, lê bi evîneke ruhî *(giyanî)* hezdikin. Di zimanê rojane de, wateyên cihêreng wergirtiye.

## 30- Zerdeşt Pêxember û Nietzsche

***Zerdeşt Pêxember*** ku wekî ***Zarathustra*** jî tê nasîn, B.Z. di Sedsala 6an de *(beriya îslamê)* zerdeştiyê damezrandiye. Ramana cezakirina bêdawî ya li gor tevgerîna mirovî, cara yekemîn ew î aniye zimên. ***Nietzsche*** ramanên xwe yên dijberê xiristiyaniyê, ji devê wî gotiye. Dîsa Nietzsche ji bo şirovekirina *(ravekirina)* ramana xwe ya mirina Xwedê û di civakê de bivênevêtiya pevçûnan *(nakokiyan),* serî li ramanên Zarathusa daye.

Dema ku kitêba Nietzsche ya *<Zerdeşt Wiha Ferman Kir, Ainsi parlait Zarathoustra, Also sprach Zarathustra> (1891)*

weşiyaye, ew hê çil salî bûye. Niha weke yek ji wan şaheserên edebiyata cihanê, tê dîtin. Kitêb ji çar cildan pêk tê û di vê berhemê de Nietzsche, xet û wesfên felsefeya xwe aniye zimên. Ji hêla rist, lewn, ehlaq û psîkolojiyê ve berhemeke gelekî wêrek e. Di berhemê de, ramana **<*Mirovê Raser*>** hatiye vegotin.

### 31- Civaka Siberojê

Di civaka siberojê de hemû mirov, dê rewşenbîr bin. Îmtiyaza rewşenbîran ya ku ji zanayî û têgihiştina zanayiyan pêk tê, dê rojekê ji holê rabe. Çimku zanayî, her diçe hêsantir belav dibe û dibe malê hemû mirovan. Herweha, meriv dikare bibêje ku civaka siberojê jî, civaka rewşenbiriyê ye.

### 32- Psîkolojiya Bindestiyê

Psîkolojiya bindestiyê, wiha dike ku Kurd hevdu tolere nakin. Li hemberî hevdu bêrehm û êrîşkar in. Di derbekî de, yek li ber çavê me dibe mirovekê pîroz û dîsa di derbekî de em ew dikin yekê beradayî û tolaz. Rêz û rêzdarî jî, kêm tê dîtin.

Pirî caran, ez rastê nivîsarên wiha têm ku rastî jî dilê min bi wan nivîsaran diêşe *(dimîne)*. Her kes xwe her tişt dihesibîne: nivîskar e, xwendevan e, rexnegir e, pispor e û wekî ku navenda her tiştî be, wisa bi quretî tevdigere.

*Helwesteke bi vî rengî, ne zanyarî ye, ehmeqî bi xwe ye. Nabe ku em hemû mirovan, li gor zanîna xwe binirxînin. Hemû kes, xwediyê wesfên cuda ne û divê em wan wisa jî qebûl bikin. Helbet wê rexne hebin, herçuqas kevneşopîyek di vî warî de tunebe jî. Lê biçûkdîtin û rûreşkirina mirovan û bi helwesteke*

*siyasî neyartiya wan, ne karê mirovên têgihîştî ye. Yek ji sedemên girîng ya ji reva Zimanê Kurdî ev rewş e mixabin.*
Beriya her tiştî, heke di civakekê de mirovên azad ku weke şexs xwediyê helwesteke xweser in tunebin, tiştên din beredayî ne. Pisporî jî, rexnegirî jî, edebiyatzanî û rêzimanzanî jî.

## 33- Xwendin û Têgihiştin

Zarokên xelkê, bi qasî *15-20* salan bi zimanê xwe ê dayê perwerde dibin û heftiyê du-sê seetan jî dersen rêziman û edebiyata xwe dibinin. Ligel vê yeke jî, heta ku berhemên serkeftî nanivîsînin, nabêjin ku *<em nivîskar in!>*
Li cem me mixabin rewş ne wusa ye û pirr aloz e. Heçiyê du-sê kitêbên kurdî dixwîne û karibe du-sê metelok û biwêjên kurdî jî deyne ser, di cih de dibe nivîskêr, rexnegir, rêzimanzan û nizanim çi? Di desta yekem de, xwendineke çak pêdiviyek jêneger e û têgihiştineke çak riya afiranderiya meriv vedike. Heke ev nebe, ne pêkan e ku meriv baş têbigihêje mijara xwe. Ji xwe edebiyat, qadek cuda ye, jêre feraseteke mezin divê û qet naşibe mijarên din yên xwendinê. Li cem me xerziyan gotinek heye dibêjin: ***<Heçiyê qetek cil xwe kir, derkete sûkê û go ez axa me!>*** Meseleya nivîskariyê jî, dişibe vê metelokê. Ji ber ku baş naxwînin, her û her gazin ji niviskaran û metnên wan têne kirin. Nivîskarên kurd jî, mixabin nema dikarin denge xwe bilind bikin û gelek gazinên derewîn jî, di encamê de wekî rastiyan tenê dîtin û nirxandin. Bi hêviya xwendin û têgihiştineke çak ya hemû xwînerên kurdî.

## 34- Li Ser Zanayiya Rojanê û Şîretên Dê û Bavan

Dê û bavê me, gelek zanyariyan ji dê û bavê xwe fêr bûne û wan jî, bi heman şêweyî wan zanyariyan fêrî me kirine. Pirî caran jî, dema ku teşqeleyek qewimî ye yan bûyerek pêk hatiye, ji çavdêriya wan jî zanyariyan top kirine, yan bûne xwediyê wan zanyariyan. Mesela ji me re her dihat gotin ku divê em ava cemidî zede venexwin, da ku em nexweş nekevin. Yan, *<lawo li ser betonê rûneyne, dê zikê te biêşî.>* Yan jî, *<îro dinya ewrdar e, dê baran bibare.>* Yan jî, *<ava gihayên çolê ji qirika mirovan re baş e.>* û hwd.
Hem mezinên me, hem jî em wusa difikiriyan ku ev zanayî rast in û encamên wan her weke xwe ne. Lê rastî ne wusa ye. Ev zanayî herdem bi kêr nayên, her car rast dernakevin yan jî encamên wan ne misoger in.
Mesela her roja ku dinya ewrdar e, baran nayê. Yan ji hemû insanan re ava gihayên çolê, mirov nikare bibêje ku baş e. Ji vê cure zanayiyê re, Zanayiya Rojane tê gotin ku ev zanayî, ne zanayiyek zanistî ye. Xwe naspêre ezmûnan û di serboriyên *(azmayişên)* jiyanê de tê hilberandin.

## 35- Lawo Ne Em Du Zilam in!

Dibêjin ku feylesofê Zenon, rojekê bi şagirdekî xwe re li ser mijareke felsefeyê xeber dide. Ew çî bibêje, şagirdê wî beyî ku bikeve tu gumanan gotinên wî hema wisa di cih de qebûl dike û wî alî vî alî serê xwe dihejîne û dibêje *'belê belê wisa ye.'*
Zenon hinekî sebir dike, lê di dawiyê de aciz dibe û dibêje: *'Lawo! Qet nebû hema carekê be jî li dijê gotinên min*

*derkeve û ramana xwe bîne zimên wey! Da ku ez jî bizanibim ku em du zilam in! '...*

## 36- Zimanê Serdestan û Berpirsiyarî

Mirovên ku armanca wan navdarî û berjewendiyên şexsî ne, bêguman berê xwe didin zimanê serdestan û xizmeta zimanê serdestan dikin. Lê mirovên ku xwe li hemberî civat û zimanê xwe yê dayîkê, berpirsiyar dibînin û vê yekê wekî meseleyeka wujdanî dinirxînin, ew jî berê xwe didin zimanê xwe yê resen ê bindest. Bazara zimanê kurdî, a niha qels e û ta radeyekî jî, mirov dikare bibêje ku tune jî. Lê tevî vê rastiyê, mirovên ku bi wateya bindestiya zimanê xwe dizanin, tevî êş, azar û aloziyan jî, dev ji xizmeta zimanê xwe bernadin.

Di civata me de, mirovên wisa hene ku tevahiya imrê xwe, dane xizmeta zimanê xwe. Civata kurdan, divê van hêjayan binase û herî zêde qedr û qîymetê, nîşanî wan bide.

## 37- Felsefe Lêgerîneke Bêrawest e

Mirov li rojava her tişt e, lê li rojhilat per û baskên mirov hatine şikênandin! Felsefe pirs e, pirskirin e, lêgerîn û nêrîneke tevahî ye. Niha li Rojavayê, girîngiyeke mezin didine felsefeyê. Çimkî wan di rabirdûya xwe de feydeyên mezin ji felsefeyê wergirtin û têgihiştine wê yekê ku beyî felsefeyê, jiyan nabe.

Xwe ji berçavkên hespan rizgar kirin. Çimkî ji bo têgihiştineka gerdûnî ya aqilane û mantiqî, wateya jiyana mirov, ehlaq, siyaset û olê pêdivî bi felsefeyê heye. Rojavayî, xwe ji kirasên teng derxistin, li bersivên pirsên

xwe geriyan û wan vê yekê bi awayekî aqilane pêk anîn. Bêguman vê yekê jî, rê li ber firehbûna felsefeyê vekir.

## 38- Li Ser Peyva Apologîayê

Apologîa, peyveke Yewnanî ye. Di felsefeya Yewnan ya serdema pêşîn de, di wateya xaweparêzî yan jî parastinê de ye. Şiroveyên mirovan yên devkî yan jî nivîsandî ne. Mirovên wê demê dema ku hatine tawanbarkirin, bi armanca xweparastinê apologiayan bikaranîne *(nivîsandine)*. Apologiaya Sokrates, yek ji wan apologiayên navdar e. Wekî tê zanîn Sokrates bi tawana 'jirêderxistina xelkê' bi mirinê hatibû cezakirin.

## 39- Li Ser Peyva Asketîzmê

Asketîzm, di wateya çîlekêşiyê de ye. Ev têgeh, hinekî ji wê têgeha ku em herdem ew bibîr tînin, cihêreng e. Di rastiya xwe de, awayekî *(terzekî)* jiyanê ye. Di vê awajiyanê de, mirov hemû nimetên ku hene yan jî em bibêjin ku em xwediyê wan in, *(xwarin, vexwarin, lixwekirina cilan û heta di warê bikaranîna demê de)* wan kêm/bisînor bikar tînin û bi vî awayî jî, jiyana xwe didomînin.

Armanc, sitandina *(bidestxistina)* riza Xwedê ye. Mirov dikare bibêje ku awayekî zelalkirin û sînorkirina nefsê ye. Di vê rewşê de beyî ku mirov li pey mal û milk bibeze, bi tenê berjewendiyên xwe biparêze û ked û nirxên mirovên din îstîsmar bike, mirov jiyana xwe didomîne. ***Asketîzm,*** herîkana jiyaneke bi vî rengî ye. Dijberê vê awajiyanê jî, Hedonîzm e.

## 40- Felsefeya Serdema Me

Felsefeya serdema me, weke hemû fenomenên *(bûyerên)* kulturê; hilbereke ***<watedayînên mirovî>*** ye û ji bo hêşinbûna wê, axa herî baş modela civaka pluralîst e *(civaka piranîperest)* e.

## 41- Li Ser Zanista Teorîk Çend Gotin

Di ramana rojhilatî ya kevin de felsefe, di bin bandûra ol de maye û wekî hewldaneke serbixwe ku xwe dispêre hêza aqil, derneketiye holê. Heta mirovî dikare vê yekê jî bibêje ku ramanwerên yewnanî gellek ramanên xwe yên felsefîk, ji rojhilatê wergirtine. Belam ramanên ku ji aliyê ramanwerên yewnan ve ji rojhilatê hatine girtin, bi awayekî gelek cuda *(cihê)* hatine sererastkirin û berfirehkirin.

Mesela geometriya Misrê, jiber ku dixwestin lehiya ava çemê Nîlê asteng bikin, derketibû holê û hatibû berfirehkirin. Ji bo vê yekê jî misriyan gelek bendavan ava kirine û nehiştine ku ava çemê Nîlê wekî lehiyekî erdên wan yên çandiniyê di bin avê de bihêle. Ango, geometrî ji bo armanceka pratîk hatibû berfirehkirin û tu carê jî xwe ji vê armanca pratîk rizgar nekiriye û ne bûye zanayiyek serbixwe û sîstematîk. Belam, ramanweran yewnanî yên berê bi taybetî jî Eukleîdes, wan zanayiyên ku xwediyê taybetmendiyên teknîkî û pratîk bûn, sîstematîze kiriye û wan kiriye weke zanisteka teorîk.

## 42- Çavê Aqil

Aqil bi çavan dibine, bi dest hîs dike, bi guh seh dike, bi poz bêhn dike, bi ziman tam dike; wan li ser hevdu kom û dabeş dike û lihev tîne. Lê heke sehekên mirovî tunebin, aqil bi serê xwe pûç û vala ye. Belam, navenda fêrbûna *(darezandina)* başî û xirabiyê jî, dil e û dil, navenda hestên mirovî ye. Çav tunebe, aqil kor e. Aqil tunebe, çav nizane ku çi dibine. Lê dema dil tunebe, tiştên ku çav wan dibinin û aqil wan kategorize dike, wateyeka wan tune û bêwate ne.

## 43- Weke Tevgereke Felsefî û Bi Terzê Yewnanî Meşşaîparêzî

Meşşaîtî yan jî Meşşaîparêzî, navê wan komên fîlozofên Misilman bûye ku bi bandûra Arîstotelesî felsefeyên xwe hilberandine. Jiber ku Arîstoteles li derve digeriya û dersên xwe bi wî hawî dida, ji vê yekê re **<*Perîpatos, Peripatetisme*>** hatiye gotin ku erebiya vê peyvê, **<*Meşşaiye, Meşşaitî*>** ye.
Meşşaîyeparêz, baweriya xwe bi aqil anîne û wiha parastine ku mirov bi rêya aqil dikare têbigihêje Qûranê û têbigihêje hemû zanyariyên dînî *(olî)*. Jiber vê yekê jî, ta radeyekî mirov dikare bibêje ku ew ***Rasyonalîst (Aqilperest)*** in. Nûnerên vê tevgerê yên sereke li rojhilatê ***El Kindî, Farabî, Îbnî Sîna*** û li rojavayê jî ***Îbnî Ruşd*** in.

## 44- Di Felsefeya Xoşewîst Augustînusî de Têkiliya Xwedê û Mirovan

Li gor baweriya ***Augustînus (354- 430),*** Xwedê yek e û li her derê ye. Li hemberî Xwedayê afiraner, mirov ne ti tişt in, ango bêqîmet in. Lewra Xwedê derêzeman e û mirov

jî, girêdayê demê ne. Xwedê bi îradeya xwe ya azad gerdûnê û mirovan afirandiye. Di destpêkê de hemû mirov azad hatine afirandin, lê Ademê mirovê yekemîn bi fersenda azadiya xwe guneh kiriye. Gunehê wî ku gunehê yekemîn e, bi rêya veguhastinê digihêje hemû mirovan û mirov êdî nikarin beyî gunehan jiyana xwe bidomînin. Beyî Xwedê, mirov nikarin ji gunehên xwe, xwe rizgar jî bikin. Rizgariya mirovan, encax bi başiya Xwedê dikare pêk were. Herweha dîsa Augustînusî wiha bawer dike, ku di navbera Xwedê û mirovan de hevrezanek mezin heye û kes nikare ji vê hevrezanê derbas bibe *(derkeve)* jor. Çimku, Xwedê û mirov, ne ji heman hevîrê ne. Tiştê girîng ew e ku mirov, bikaribin Xwedê binasin. Ji ber vê yekê jî Augustînusî wiha gotiye: *<Ez dixwazim bi tenê Xwedê û rih binasim, ji bilî wan tişteke din jî, min eleqeder nake.>*

## 45- Di Tevgera (Mezheba) Eşariyeyê de Îradeya Îlahî

Damezranerê vê ekolê *(xwendegehê)* ***<Ebu'l-Hasen el-Eş'ârî-(324/935-36)>*** ye û ev tevger, wekî xwendegeheka kelamê hatiye qebûlkirin. Endam û aligirên vê xwendegehê wiha diparêzin ku bi riya aqil, şirovekirin û têgihiştina Qûranê ne pêkan *(gengaz)* e û a ku xwedîbandûr e ne aqil e, ol û îman in. Zanayiya mirovî, qebûl nakin û li dijî hemû zanayiyên ku bi îmanê re nakok in, derdikevin. Hemû tiştan bi îradeya îlahî *(Xwedê)* ve girêdidin. Di Sedsala 10an de, bandûra wan gelekî mezin bûye.

## 46- Dilêrîna Felsefî ya Tevgera Mutezîle

Li Gor Beşdarên Tevgera Mutezîle; bi riya aqil, mirov dikarin Qûranê şirove bikin û ev yek pêkan e. Peyva **<*Mutezîle*>** ê, di wateya *<kesên ku xwe cihê kirine, kesên ku veqetiyane, kesên ku xwe dûr kirine, yan jî kesên xwe dane alî>* de ye. Kesên ku baweriya xwe bi vê mezhebê tînin yan beşdarên vê tevgerê bûne, ji wan re jî **<*Mutezîlî, Mutezîleparêz*>** hatiye gotin.

Mutezîleparêzan, dilêrîneka serbest ya felsefeyê parastine û wekî tevgereka rasyonalîst *(aqilperest)* hatine dîtin. Dîsa li ser tiştên ku divê em îmana xwe bi wan bînin û li ser tiştên ku divê ku em îmana xwe bi wan neynin, rawestiyane û li wan babetan hûrbûne.

Li gor baweriya Mutezîleparêzan; Xwedê tekane afirander û heyînê afirander e û ezelî *(bêdestpêk)* e. Li dijî, baweriyên derveyê aqil derketine. Mutezîleparêzan wiha bawer kirine ku mirov bi xwe jî dikarin biryara kirin û tevgerên xwe bidin û ev yek, ne girêdayî qederê ye.

## 47- Di Utopyaya Bajarê Xwedîerdem de Aqlê Pratîk

***Farabî (870-950)*** ku li rojavayê wekî Alpharabius tê nasîn, di teoriya xwe ya **<*Yên Aqilmend*>** de dibêje ku di pêşiya Xwedê de, di destpêkê de aqlekî yekemîn derketiye holê û ji aqlê yekemîn, bivênevê aqlekî din der çûye, giyan û asîman çêbûne.

Di warê şirovekirina bûyerên xwezayê de teoriya Arîstoteles ya **<*Madde û Formê*>** qebûl kiriye. Li gor ramana Farabî, sedemê hemû heyînan Xwedê ye û hemû

heyîn, ji Xwedê weke aqil der çûne û heyîna ku herî zêde ji Xwedê dûr e jî, made ye. Wezîfeya mirovan jî, divê ji madeyê xwedûrkirin û ji bo nêzîkbûna Xwedê, zelalkirina rih be. Li gor dilêrîna Farabî; bextewariya civakî encax bi riya rasteqîniyê ku ew jî hilbera aqlê pratîk e, bi rastî û başiyê dikare pêk were. Farabî wisa dixwaze ku bi riya aqlê pratîk, hem mirovên desthilatdar û hem jî yên ku têne birêvebirin *(hemwelatî),* xwe bigihînin civaka îdeal ya xwedîerdem. Hêmanên vê civaka îdeal ya xwedîerdem, di berhema xwe ya utopîk de ku navê wê ***<Bajarê Xwedîerdem>*** e, destnîşan kiriye.

## 48- Di Teoriya Îbnî Sîna de, Pêvajoya <Aqilê Çalak>

Îbnî Sîna ***(980-1037)*** li rojavayê bi navê ***<Avicenna>*** tê naskirin û li cîhana îslamê jî, jêre dibêjin ***<Şeyhûl Felasife-ango, Şêxê yan jî serokê Fîlozofan.>*** Îbnî Sîna jî, wekî Farabî li ser dozîneya Arîstoteles ya ***'madde û formê'*** rawestiyaye. Îbnî Sîna jî wekî Farabî wiha bawer dike ku hemû heyîn ji Xwedê der çûne. Di destpêkê de bi tenê Xwedê heye. Ji Xwedayê ku heyînek rasteqîn û bivênevê ye, giyanek saf der diçe. Ev giyan *(rih),* sedemê pêşîn e. Ji vî sedemê pêşîn jî, hemû giyan û laşên ku di gerdûnê de hene, der çûne. Îbnî Sîna ji vê yekê re dibêje, ***<aqilê çalak.>***

Mirov, di asta pêşveçûna rih ya dawî de hilika heyînan dibîne û têdigihêje wan. Dîsa li gor bîr û baweriya Îbnî Sîna, bextewarî xwepakijkirin rih e û ber bi aqil ve, qesidîna mirova ye. Îbnî Sîna, hewl daye ku felsefe û olê, lihev bîne. Gelekî girîngiyê daye ezmûnê û mîna

fîlozofekî rasyonalîst/aqilperest hatiye dîtin. Navê wî yê rasteqîn: <*Ebu Ali el-Hüseyin ibni Abdullah ibn-i Sina el-Belhi*> ye û berhema wî ya herî naskirî <*El-Kanun Fi't Tıb – Zagonên Zanista Bijîşkiyê)* ye.

## 49- Di Xirîstîyaniyê de Naguheriya Rizgariyê

Di filehtiyê de, Xwedê dibe mirov. Ango, Hz. Îsa. Hz. Îsa pîroz e û divê ku mirov xwe bi ve pîroziyê re bikin yek. Dema ku çarenûs, çarenûsa mirovî bigihêje çarenûsa Hz. Îsa û pêre bibe yek; wê demê mirin hêsantir dibe. Di vê dîtina rewiştî de, mirov gunehkar tê dinyayê û mehkûmê mirinê ye. Herweha di bingeha vê nêrîna rewiştî *(ehlaqî)* de ji gunehan rizgarbûn heye û mirov, encax bi alîkariya Xwedê dikare bigihêje vê yekê.

Lewra di dînî xiristiyaniyê de, mirov ji zayenda xwe ve weke gunehkaran têne dinyayê. Sebebê gunehkariya wan jî, Adem pêxember bi xwe ye, ku li ber fermana Xwedê rabûye û ji bihuştê hatiye qewirandin. Dîsa li gor vê dilerîna xiristiyaniyê, hêzeka ji derve herdem mirovan ezmûn dike û mirov, li hemberî xirabiyan şer dike. Ev şer jî, pîvanên rewiştî diafirînin û tînin hola civakî. Belam, li gorî felsefeya antîk yewnanî; hêza mirov besî mirov e. Lê li gorî filehtiyê, bi serê xwe û bi hêza xwe, mirov nikare xwe rizgar bike.

## 50- Di Felsefeya Antîk Yewnanî û Filehtiyê de Ramana Xwedê

Têgeha *(ramana)* Xwedê, mîna feraseteka filehtiyê xwiya dike. Hêza afirandinê ye û ev hêz, ji tinebûnê heyberan diafirîne hebûnê *(hebûnatiyê).* Herweha, ev têgeh hevrezanekî jî dixe navbera Xwedê û ebdên wî. Belam, li gorî dîtinên serdema antîk; Xwedê ne afirander e. Ew, bi tenê mîmarê gerdûnê ye. Made jî, weke Xwedê *(Xwedayan)* ezelî ye. Bi gotinekê din: Made, heyîn û xweza qet ne hatine afirandin. Lewra, ew her hebûn û ezelî ne.

***Li Gor Felsefeya Antîk:*** Li gerdûnê <*caos*> hebûye û di vê **<caosê>** de tevlîheviyeke xwiya dikir. Paşê, Xweda yan jî Xwedayan, wê tevlîheviyê ji holê rakirine û rêkûpêkiyeke gihandine gerdûnê. Belam, dûvre di danezanîna ola filehtiyê de angaşteka din xwiya dike û li gorî vê angaştê jî Xweda, gerdûnê di şeş (6) rojan de afirandiye. Felsefeya ***Platonperestiya Nû*** jî; li gorî danûstandina afiraner û aferînê, nêrîneke heyama antîk e.

***Li gorî vê felsefeyê:*** Xwedê, heyîn bi xwe ye û bi vî awayî, tiştên din para xwe jê distînin û xwe dikin heyîn. Belam, di felsefeya filehtiyê de nêrîneka wiha tune û qet, peyda jî nabe. Di vê mijarê de niqteyeka giranbiha heye ku ew jî ev e: Bi bandûra ***Platonperestiya Nû*** re, mistîsîzm bûye dijberê filehtiya ortodoksê û piştra, piştra, pêşengiya tevgera reformê kiriye.

## 51- Di Felsefeya Îbnî Rûşd de Bandûra Arîstotales

***Îbnî Rûşd (1126-1198)*** di Serdema Navîn de wekî damezranerê Arîstoparêziyê tê dîtin û li gor bîr û baweriya Rûşd, Arîstoteles tekane fîlozof e. Dîsa li gor baweriya Rûşd, heke mantîqa Arîstoteles tunebûya, wê demê ne zanist û ne jî zanayî pêk nedihatin. Îbnî Rûşd,

berhemên Arîstoteles şirove kiriye û bi awayekî taybet, wan rave kiriye. Mirov dikare bibêje ku rojavayê Arîstoteles bi saya xebatên Îbnî Rûşd naskiriye. Îbnî Rûşd wiha parastiye ku hemû tiştên di ol de ne, mirov dikare wan bi riya aqil îsbat bike. Li gor ramana Rûşd; made û zeman, bêdestpêk û bêdawî *(ezelî û ebedî)* ne, ango eternal in. Ango, dibêje ew her hebûn. Dîsa dibêje ku hege livdarî tunebe, zeman jî nikare were fikirîn. Îbnî Rûşd, wisa bawer dike ku rih bêmirin *(zindebar)* e, lê <*rihê mirovî*> ezelî ye. Di berhemên xwe de, li ser lihevkirina ol û felsefeyê û li ser hevnegirtîna fîlozofan, rawestiya ye.

## 52- Li Ser Zanistên Formel (Fesalî) Çend Gotin

Di nav cîhana pirsan de hinek pirs hene ku mirov bi hêsanî dikare wan bibersivîne û nekeve tu gumanan. Ev pirs jî, pirsên emprîk in û mirovî dikare bersiva wan, bi rêya çavdêrî yan jî ezmûnan misoger bike. Mesela em bi hêsanî dikarin bibêjin ku Amed, bajarê herî mezin yê Kurdistanê ye û vê zanayiyê, bi rêya lêkolînên demografîk û belgeyan, dikarin îsbat jî bikin. Lê ne pêkan e ku em pirsên matematîk û geometriyê, bi vî awayî bibersivînin. Ango, pirsa 2X2=? ê, em nikarin bi rêya ezmûn û çavdêriyan bibersivînin, yan jî îsbat bikin. Em ancax dikarin xwe bisperin aqil û bi vê rêyê dikarin bersiva vê pirsê bidin. Ji van celeb zanistan re, ***zanistên fesalî (zanistên formel)*** tê gotin.

*Ê baş e, sebebê binavkirineke bi vî rengî çi ye gelo?*

Lewra, zanistên fesalî xwe naspêrin ezmûn û çavdêriyan. Em ne dikarin hejmara <*yek*> ê di laboratuaran de

hilberînin û ne jî, li ser rê em dikarin li wan rast werin. Zanistên fesalî, bi temamî li gor hêmanên *(prensîpên)* aqil û mentîqê û bi rêya deranan dixebitin. Matematîk û mentîq, ewilî hindek danasînan didin me û ji van danasînan dest pê dikin û hindek deran têne bidestxistin.

***Çend taybetmendiyên zanistên fesalî***

***1-*** *Zanistên fesalî/formel bi temamî xwe disperin aqil û hêmanên (prensîbên) aqlî.*

***2-*** *Karên xwe bi danasînan/pênaseyan û bi deranên ku xwe dispêrin wan deranan didomînin.*

***3-*** *Mijarên wan, razber/soyut/nedîtbar in.*

***4-*** *Heyînên ku dibine mijara zanistên fesalî, di zeman û mekanê de cîh nagrin.*

***5-*** *Zimanekî sembolîk bikartînin, ji ber vê çendê jî, zanistên çêkirî û îdeal in.*

***6-*** *Zanistên xwezayê û zanistên mirovî, ji zanistên fesalî sûdwerdigrin û bi xêra vê alîkariyê dibine zanistên nesnel û teqez.*

***7-*** *Rêbaza deduksiyonê bikartînin.*

## 53- Bahoza Postmodernîzmê

Me wisa dipa ku em ê jî bi xêr û xweşî modernîzma xwe di van demên nêzîk de bijîn. Lêbelê, a niha bahoza postmodernîzmê rabûye û hemû nirxên modernîzmê daye ber xwe. Hemû nirx û stargehên ku rast dihatin zanîn, yek bi yek têne guherîn û ji kokê ve dihêjin. Avahî, xwendin, balkêşî, teoriyên sereke tevde bi lezgînî diguherin û nema weke xwe dimînin. Têgihiştineka rast ya guherîne, bi sere xwe tene jî bûye felsefeyeke mezin û

sereke. De inca? Gelo di rewşeka wiha aloz de, pêkan e ku em jî rojekê modernîzma xwe bijîn, yan jî ev yek pêkan e?

## 54- Di Felsefeya Îmamê Xezalî de Îman û Aqil

***Xezalî (1058-1111)*** berî her tiştî li hemberî helwesta yekkirina aqil û îmanê derketiye û di nav çerçoweya felsefeya îslamê de, di warê epîstemolojiyê *(felsefeya zanayiyê)* de xebatên xwe pêkaniye. Pirsên *(pirsgirêkên)* ku wî dixwest çareser bike, pirsên wekî: *<Gelo em dikarin ji zanayiyeka misoger behs bikin?, Zanayiyên ku em bi riya aqil û sehekan têdigihêjine wan, gelo ew zanayiyên misoger in?, Gelo felsefe dikare zanayiyên misoger/tequz bide me?*> ne.

Li gorî bîr û baweriya Xezalî; aqil, di babetên olî de dikeve nakokiyê û sehekên me jî, herdem me dixapînin. Ji ber vê yekê jî, zanayiyên ku xwe dispêrin aqil û sehekan, ne misoger in û divê neyêtin pejirandin. Ya ku esas e, îman e. Xezalî, îman û aqil, ji hevdu cihê kiriye û ya îmanê hilbijartiye û felsefeyê xistiye xizmeta îmanê *(olê)*. Xezalî ji ber ku ferasetê *(sezgiyê)* weke çavkaniya zanayiyê pejirandiye, wekî nûnerê entuîsyonîzmê yê rojhilatê hatiye qebûlkirin. Li hemberî helwesta fîlozofên ku dixwestin îman û aqil li hev bînin *(wan bi hevdu re girê bidin)* rabûye û hemû rexneyên xwe di pirtûka xwe ya bi navê ***<Hevnegirtina Felsefeyê/Feylesofan> (Tehafût el Felasife)*** de îfade kiriye.

## 55- Li Ser Felsefeya Felsefeyê Çend Gotin

Di nav hemû cure zanyarî *(zanayiyan)* de, a ku herdem rexne li xwe digre û carekê din li ser encamên xwe hûr dibe, guman têde nîne ku felsefe ye. Ji vê helwesta felsefeyê re, *<Felsefeya Felsefeyê>* tê gotin. Mirov nikare bibêje ku em dikarin, fizîka fizîkê bikin; lê felsefeya felsefeyê dibe û pêkan e. Ev helwesta felsefeyê, rê li ber hişkebawerî *(dogmatîzmê)* digre û rê nade ku encamên felsefeyê ti caran bibin encamên tequz *(misoger)* yan jî naguher.

Bandûra vê helwesta felsefeyê, li ser hemû zanistan jî heye û bi awayekî eşkere, ev yek tê xwiyakirin. Mesela di têgihiştina **<*zanista nû*>** de, encamên *(zagonên)* zanistî, êdî mîna zagonên mayende *(herheyî)* nayên dîtin û mîna **<*zagonên ku dibetiya rastiya wan bilind e*>** têne qebûlkirin. Lewma jî, pirî caran em ji bo felsefeyê dibêjin ku ew **<*lêgerîneke bêsekn/bêrawest e*>** û stargeh yan jî dereka ku felsefe dixwaze xwe bigihîne wir jî tune.

## 56- Di Serdema Navîn de Rewşa Felsefeyê

Di Serdema Navîn de wateya teqez *(girîng)* ne di gerdûnê de ye, lê di yên ku ew afirandiye de ye û mirov, encax bi îmaneka xurt dikarin xwe bigihînin wê wateyê. Xwedê afiranerê gerdûnê ye, yê ku yekemîn car gerdûnê çêkiriye ew e û di heman demê de, mebesta wê ye. Li gorî termînolojiya ***Arîstoperest,*** Xwedê him sedemê çalak ***(causa efficiens)*** û him jî, sedemê armancê ye. ***(causa finalis)*** Ji ber vî sebebî bi serê xwe tenê, ti qîmeta gerdûnê tune. Qîmeta wê, ji rêza duyem *(talî)* ye. Ew ji hêla gihêjtina armancê ve di nav xwe de, pergaleke hîyerarşîk

û bi qedeme, nîşan dide. Ev pergal ji hêmanên binî ve dest pê dike, ji mirovî derbas dibe û heta xwe digihêjîne Xwedê. Mirov li ser rûyê erdê, nûnerê Xwedê ye û rihê mirovî, di rewşa herî dawî de girêdayî Xwedê ye.

Di vê xalê de felsefe weke zanyariyeke di gerdûnê de, li gor zanyariya ku pişta xwe daye îmanê, ji rêza duyem e. Ew encax, li cem îman û teolojiyê; xwediyê erka **<*xulamtiya teolojiyê*>** û **<*derbaseya odeya îmanê*>** ye. Lê di dawiya serdemê de her çûye, felsefe rêya xwe ji teolojiyê cihê kiriye û ketiye rewşeka dijberê teolojiyê. Di dawiya vê pêvajoyê de felsefeyê, berê xwe daye **<*xeta aqil*>** û teolojiyê jî, berê xwe da **<*xeta îmanê*>** ku, di herî dawiyê de jî, dilêrîneka **<*rastiya cotik*>** derketiye holê.

## 57- Lêgerîna Arkheyê di Çanda Antîk Yewnanî de

Çanda Antîk Yewnanî û şaristaniya wê, xwediyê qerektereke dualî bû. Ji aliyekî ve di warê kulturê de gihabû asteka gelekî baş, lê li hêla din jî di hinek babetan de xwediyê hinek adetên xirab bû. Mesela, li aliyekî baweriya xwe bi ***Xwedayên Olîmposê*** dianin û li aliyê din jî, zarok û jin di civakê de kole bûn. Cîbicîkirinên bi vî rengî, piştî demekê wiha kir ku di civakê de bêhevîyêke dest pê kir û hinek bûyerên ku civakê bêhêvî dikirin, derketin holê.

Li hemberî vê çanda dualî ya ku civakê bêhêvî dikir, fîlozofan dîsa jî têgihiştine ku di gerdûnê de guherînek bêrawest heye û gerdûn, her dem di guherîneke wiha de ye. Ji jiyanê ber bi mirinê, ji zarokatiyê ber bi pîrbûnê, ji biharê ber bi zivistanê ve, her dem guherîn û

veguhêrîneke bêrawest heye. Divabû li pişt vê guherîna bêrawest, heyîneke ku her dem hebûna xwe didomîne jî hebûya. Destpêka felsefeyê û xwesteka şirovekirina ***<Îyonyayê>***, bi lêgerîn û pirskirina vê heyîna mayende ***(arkhe)***, dest pê kiriye û îyanyayiyan, xwestine ku bi vê yekê bizanibin. Fîlozofên Îyonyayê, navê vê heyînê danîne ***'arche.'*** ***Arkhe***, ew element bû ku ligel hemû guherînan, nedihat guherîn û her dem weke xwe dima.

Piştî hinek rûdanên ramanî, ***Thales*** wekî fîlozofekî dertê qada civakî û ku ***B.Z. (Beriya Zayînê- Beriya Zayîna Îsa Nebî)*** di sedsala 6 an de jiya ye, gotiye ku arkhe av e. Hinek fîlozofên din jî ku xwediyê ramanên cihêreng bûn, wan jî arkheyê, bi madeyên *(elementên)* cihêreng şirove kirine. Mesela ***Anaksîmenes (Anaximenes)*** hewayê û ***Herakleîtos*** jî, agir weke elementa bingeh dîtiye û bi vî rengî, arkhe hatiye şirovekirin.

Fîlozofên îyonyayî, dema ku li madeya bingehîn ya gerdûnê vekolane, tu rêbaz yan jî ezmûnên *(deneyên)* zanistî bikar neanîne û bi riya ****spekulasyonê,*** xwestine ku xwe bigihînin encamê. Herçuqas li ser hinek babetên razber *(soyut, nedîtbar)* yên weke guherîn û yekîtiyê rawestiyabin jî, vê yekê bi bingeheke madî pêk anîne. Elementên ku ji bo şirovekirina çêbûna gerdûnê hatine bikaranîn; yen weke agir, av, hewa, ax û hwd. hemû jî, madeyên madî û girgîn *(somut, berbiçav)* in. Dema vê yekê pêk anîne jî, mirov dikare bibêje ku xwe ji bandûra sehekan rizger kirine û bi awayê razberkirinê *(soyutlamayê)* vê yekê pêk anîne.

***Spekulasyon:*** Zanayiya ku xwe naspêre ezmûnê û bi tenê bi riya aqil tê hilberandin. Encamên zanayiyên ku bi riya spekulasyonê têne hilberandin, nayên pîvandin yan ceribandin.

## 58- Felsefeya Ehlaqê ya Mewlana Celaledînê Rûmî

Li gorî bîr û baweriya *Mewlana Celaledînê Rûmî* ***(1207-1273)***, Xwedê xwestiye ku xezîneya xwe nîşan bide û ji ber vê yekê jî, gerdûnê afirandiye. Sebebê afirandina gerdûnê jî, ev yek e.

<*Xwedê, ji bo ku hêza xwe nîşan bide gerdûnê afirandiye. Tekane heyînên ku dikare bigihêjine delalî û ilmê Xwedê, mirov in. Xwesteka vê zanînê, rê li ber zewqên dinyayî digire. Jiber vê yekê jî, divê mirov li hember zewqên dinyayê têbikoşin.*>
Di ramanên Mewlana de destnîşankarê zagona êhlaqê ya gerdûnî, eşq e. Ev eşq, prensîbên tevgerîna mirovî destnîşan dike. Ji ber vê yekê jî kê/kî be bila be, divê were hezkirin. Li gor baweriya Mewlana, mirov encax bi rêya eşqê dikare bigihêje Xwedê. Di berhema xwe ya sereke **<*Mesnewiyê*>** de li ser fazîlet, erdem û başiyê, ramanên girîng pêşkêş kiriye.

## 59- Felsefeya Ehlaqê ya Hacî Bektaşê Welî

***Hacî Bektaşê Welî,*** ramana ***<wehdetî wicûdê)*** *ango* ***<yekîtiya heyînê>*** parastiye. Li gor vê berbiçûnê, hemû tiştên ku hene ji Xwedê der çûne. Mirov ji bo bikaribin

yekîtiya heyînê nas bikin, divê ku ji mertebeyên cihêreng derbas dibin. Di mertebeya yekemîn de, mirov hemû tiştî bi Xwedê şirove *(rave)* dikin. Di mertebeya duyemîn de, cûdahiya madî û manewiyatê diparêzin û hemû tiştên ku hene, bi hilikeke hevpar şirove dikin. Di mertebeya sêyemîn de jî, digihêjine nêrîna ***'yekîtiya heyînan, wehdetî wicûdê'*** û têdigihêjinê ku ew jî, xwiyakirineke Xwedayî ne. Herweha di dilêrîna ehlaqî ya Hacî Bektaşê Welî de bingeha zagona ehlaqê, hezkirina ji Xwedê û mirova ye.

## 60- Xweza di Felsefeya Arîstotales de

Di felsefeya ***Arîstotales (B.Z.384-322)*** de xweza, hêmaneke tevgerînê ye, her dem diguhere û xwediyê bandêrekê *(sîstemekî)* ye. Di xwezayê de tu guherînên bêrêzik *(serberdayî)* tune nin û hemû guherîn bi rêz, bêrawest û xwedîarmanc in. Lewra, ev guherîn <***teleolojîk***> in. Ango di pêşiyê de ew encamê tiştekê ne, ku ew jî di xwezayê de ji xwe hene. Lewra, xweza dewr û dewranên din, ji nav xwe derdixe *(diafirîne)*.

***Li gor Arîstotales, xweza xwediyê du hêmanên bingehîn e.***
**1-** *Guherînên ku di xwezayê de çêdibin bi rêz, bêrawest û xwedîarmanc in. Lewra, ev guherîn bi awayekî* **<*teleolojîk*>** *çêdibin. Bi gotineka din: Ev guherîn ji tiştekê xwezayî çêdibin û piştra, xweza domeneke/heyameke din ji nav xwe derdixe holê û ev guherîn jî, guherînên hûndirîn in. .*
**2-** *Guherînên xwezayî, bi hêlaka qenc ve ne. Lewra, xweza bi awayekî bêrawest xwe dikemilîne. Ev nêrînên Arîstotales, ramana rojavaya Ewropayê xistiyê bin bandûra xwe û ramana*

*Ewropayê, jê gelekî ketumet bûye. Xwiyaye ku Arîstotalesî xwezayê, mîna tişteke zindî ditiye û wisa jî şirove kiriye.*

## 61- Li Ser Felsefeya Serdema Nû Çend Gotin

Ramana nû, mirovan di navenda her tiştî de dît û mirov bûne navend. Pêşniyara ***Descartesî*** ya bingehîn, ev e: ***<Cogito ergo sum!> (Ez li ser hişê xwe me, 'Ez bi xwe dizanim, têdigihêjime hebûna xwe' lewma ez heme.)*** Ev pêşniyara ***Descartesî,*** ji bo pêkanîna felsefeyê dibe prensîbeke bingehîn û di dawiyê de di <***Şoreşa Kant>*** de, digihêje xala *(niqteya)* xwe a herî bilind.

Li gorî vê yekê tîna ***(aqil, zêhn û binehişê mirov)*** mirovî, rasterast berê xwe nade nesneyan. Nesne berê her tiştî, divê di tîna mirovî de werin bikaranîn. Zanayî, rasterast ne encama dengvedana nesneya ye; beravajiya vê yekê, encama têgihiştina hişê me ye. Bi vî awayî ***<Roja Nû>*** ya ku cîhana felsefî ronî dike, êdî ne ***<Cosmosa Grekan>*** û ne jî, ***<Xwedayê Serdema Navîn>*** e. Ev ***<Roja Nû>,*** ji bilî aqil; ne ti tişt e.

***Rasyonalîzm*** û ***Empirîzm*** jî, di vê pêşveçûnê de dibin du tevgerên bingehîn. Di ***Rasyonalîzmê*** de mirov berî her tiştî; weke heyînên aqlî *(aqilmend)* têne dîtin û li gorî vê tevgerê, biryara herî dawî aqil bi xwe dide. Di ***Empirîzmê*** de jî, mirovî weke heyînek sehekî ye û peywist e her cure felsefe, pişta xwe bide zemîna ezmûna *(deneya)* sehekî. *(Ji ber vê yekê jî ev tevger, weke* ***Sensualîzmê*** *jî tê bi bîr anîn.)* Lê çi heye ku, di dawiya ***Serdema Nû*** de ***mengîweriya (îdealîzma)*** alman, carekê din berê xwe daye makro û mîkrokosmosa grekiyan.

## 62- Li Ser Felsefeya Hemdem Çend Gotin

Li gor zanînan ***Felsefeya Hemdem,*** piştî felişandin û belavkirina, spekulasyona mengîwer dest pê kiriye. Ev felsefe wiha dixwaze ku xwe berde kûrahiya mirovên girgîn *(berbiçav),* jiyana wan ya dîrokî û hemû hêlên jiyanê. Serdema Navîn, <*Xwedê*> û Mengîweriya *(îdealîzma)* ***Serdema Nû*** jî, tîn *(zêhn û aqil)* û ramanê, derxistiye ser text.

***Felsefeya Hemdem, tîn û ramanê ji text tîne xwar.***

Çimkî ev herdu têgeh jî, encax di fenomenên jîyana mirovî de dikarin werin dîtin. Tîn û raman, avahiyên raser in ku di her çandê de bi fesaleke *(şeklekî)* cihêreng dertêne holê û dengvedanên jiyana mirovî ne. Îdeyeka *(ramaneka)* ku serwerê hemû mirovahiyêye jî, tune. Di dewsa aqlekî gerdûnî de sîstemên metafizikî hene, ku bûne wesfên xwerû yên kulturên cihêreng.

Di dawiyê de bi kurtî mirov dikare bibêje ku, felsefeya serdema me ev e: *<Weke hemû fenomenên/bûyerên kulturê, felsefe jî hilbereke* ***<watedayînên mirovî>*** *ye û ji bo hêşinbûna wê axa herî baş, modela civaka pluralîst e/civaka piranîperêst e.>*

## 63- Li Ser Pêdiviya Felsefeyê Çend Gotin

Ji serdemên berê zêdetir, îro em bi pirsgirêka wateyê re rûbirû ne. Em di serdemeke wiha de dijîn ku piraniya mirovan, bêked û bêşixûl dixwazin ku bibin xwediyê gelek tiştan.

***Di demekê wiha de pirsên wekî:***

*'Em kê/kî ne?',*
*'Wate û armanca jiyana me, çi ye gelo?',*
*'Di nav hewqas zanayiyan de, gelo çuqasî zanayiyên me rast in?',*
*'Rastiya zanayiyên me ji kû derê têtin?',*
*'Gelo em heta çi radeyî serbest in?',*
*'Gelo rast e ku modela herî baş, demokrasî ye?',*
*'Gelo, zagon ji bo hemû mirovan wekhev têne xebitandin?'* û hwd. bi girîngiyeke mezin li hemberî me radiwestin û li benda bersivandinê ne. Tiştekî berbiçav e ku rêya herî baş ya bersivandina van pirsan *(pirsgirêkan)* jî, felsefe ye.

## 64- Ji Felsefeya Pythagoras û Şopgerên wî

Objeyên ku di gerdûnê de hene, her dem xwe bi wesfên xwe nîşanê me didin û em, wan bi *rûçikên* ***(wesfên)*** wan dinasin. Belam, ew *wesfên* ***(chacteristicên)*** ku di gerdûnê de hene, hemû ne xwediyê wesfên giştî ne. Her obje, cor, celeb û tişt, xwediyê wesfên cuda ne. Herwekî: Pelek, xwediyê wesfa şîn e. Lê hemû obje, ne şîn in. Lê tiştek heye ku mirov dikare wî tiştî li hemû tiştan bisepîne *(bicîh)* bike. Lewra ew xwe di naveroka wan de diparêze, ku ev tişt jî ***hejmar*** e. Gerdûnekê bêreng û bêtehm dibe, lê gerdûnekê bêhejmar nabe û mirov, vê yekê nikare qet pêşnûma jî bike. Warê ku lê piranî hebe, dê li wê derê hejmar jî hebin.

## 65- Heyîn di Felsefeya Parmanîdes de

Tezahûra *(pêşnûmeya)* tunebûnê tune, tişteke ku tunebe wê mirov çawa li ser bihizire, yan jî bipeyîve? Tiştên ku mirovî bikaribe li ser bihizire, ew hene û heyîn in. Ango

tişteke ku hizra wan heye, ew heyîn in. Lewra, mirov nikare li ser tunebûnê bifikire yan wê tezahûr bike. Peyva li ser tunebûnê, peyva ne ti tiştî ye. Lewra, tunebûn tune û nava wê, qet tije jî nabe.

***Di pêşniyara <heyîn heye.> de.***

***a- Guherîn***

***b- Bûyîn***

***c- Livdarî,*** tune. Lewra, ji bo heyînê rabirdu qet tune.

Ji bo heyînê, rabirdû û siberoj tune. Lewra, ew ***<eternîtîk>*** e. Ango, ji dem serbixwe û aza ye. Heyîn, bêqeyd û bêmerc weke xwe ye û bi xwe ve ye. Ji tu tiştî dernayê, nazivire û naqulipe tişteke din. Cewhera xwe, di naveroka xwe de vedişêre û yan jî, ji xwe ew têde heye. Rastiya hebûna wê jî, xwe naspêre ti tiştî. Her dem, bi xwe ve dimîne û weke xwe ye. Heyîn bi tenê xwediyê wesfek tenê ye ku, ew jî heyînatî ye.

## 66- Erdem di Felsefeya Antîsthenes de

Li gor bîr û baweriya ***Antîsthenesî*** tiştê herî girîng, erdem e û erdem jî bi zanyariyê bi dest dikeve û rewşeka wisa ye ku mirov dikare bibêje ku ev rewş, besî xwe ye. Mirov divê bikaribe xwe ji hemû pêdiviyan rizgar bike û bi tenê xwe bispêre xwe.

Di vê xalê de azadî, ji hemû pêdiviyan û ji gurzên civakî xwe rizgarkirin e. Di vê wateyê de ramanên ***Antîsthenes*** yên felsefik, rexnekirina nîrxên medeniyetê û nepejirandina wan diguncîne. Antîsthenes gelekî di bandora Gorgîasî de maye û di felsefeya wî de mirov dibîne ku gelekî şopên ***Sofîzmê*** jî hene. Di mijarên

yekîtiya heyînê û nebesbûna/têrênekirina danasînên me de, ramanên wî gelekî nêzîkê nêzîkayîtêdana ***Gorgîas*** e. Zanayî, peyvên binavkirina nesneyan ye û darazên me jî, bi tenê kombûna van peyvan e. Di vê xalê de ramanên wî ji ramanên ***Platonî*** cuda ne, ku Platonî têgehan weke tiştên rasteqîn didît û zêdetir wek ramaneka ***Nomînalîst*** e. Armanca jiyanê ***berxwîdarî (endaimonia)*** ye û ev yek jî, encax bi erdemê dikare pêk were. Erdem jî, zanyarî ye. Ango, besbûna ***<ji xwe re ji xwe re>*** ya mirovî ye.

## 67- Ramana Bingehîn ya Tevgera Fenomenolojiyê

Fenomonolojî *(phenomenology) (Zanista Diyardetiyê, Diyardenasî)* di literatura felsefeyê de, tevgereke ramanî ye û bêtir bi navê Edmund Gustav Albrecht û Edmund Husserlî tê zanîn û naskirin. Ji ber ku em bikaribin baş têbigehêjine ramana bingehîn ya vê tevgerê, divê em hebekî vegerin ser felsefeya Kantî ya rexneyî û li ser têgehên wî yên Numen û Fenomen rawestin. Immanuel Kant, wanekan kiribû du beşan; ango Numen û Fenomen.

Numen, tê wateya tiştê ku di xwe de ye, yan jî tiştê ku bi xwe ve ye. Ango beyî ku di bin bandora hiş û têgihiştina sehekên me de bimîne, tiştek çi be, ew e. Wekî tê zanîn Kant di warê zanayiyê de, zêhna mirovî aktîv dîtiye. Yek jî gotiye ku zanayiyên me bi ezmûnê dest pê dikin, lê bi ezmûnê temam nabin, ango temamiya zanayiyên me ji ezmûnê nayên. Naskirina me ya nesneyan, encax bi aliyên wan yên ku xwe bi me didin xwiyakirin pêk tê. Ji ber ku wesf û çendaniyên wan, xîtabê sehekên me dikin, em bi wan dizanin. Ev yek, aliyê *(wesfê)* fenomen ya waneka ye.

Nesneyek heke ji wesf û çendaniyên xwe were cudakirin, tiştê ku di dawiyê de dimîne, ji bo me nenas e û em nikarin pê bizanin, ango ew numen e. Lêbelê, ***Edmund Husserl (1859-1938)*** dibêje tiştê ku ***Kant*** ji wan re dibeje numen û xwedêgiravî mirov nikare bi wan bizanibe, dikarin werin zanîn. Ji bo vê yekê jî, divê mirov naveroka hişê xwe bêxe nava kevaneyekî *(parantezekî)* û wiha nêzîkê wê bibe. Lewra, em herdem bi nîyetekî nêzîkê nesneyan dibin û ev yek jî, rê li pêşdarazan vedike. Ji bo ku em bikaribin rê li ber vê yekê bigirin û nesneyek çi be em bixwazin ku wiha wê binasin, beriya her tiştî divê em hemû bîr û baweriyên xwe yên berê deynin aliyekî û wiha, xwe nêzîkê wê nesneyê bikin. Di vê xalê de, di babeta zanîna nesneyan *(wanekan, heyberan)* de, feraset *(pêhesî)* dest bi kar dike. Ji bo pêzanîna hilika wanekan, pêdivî bi feraseta rasterast heye ku ev yek jî, bi rêya pêşniyarên rast û dirist pêk tê. Edmund Husserl wiha bawer kiriye ku divê felsefe xwe bispêre fenomenolojiyê û zanayiya wanekan ya misoger û naguher, encax bi zanîna hilika wan dikare were hilberandin.

## 68- Ehlaq jixweber (Spontan) e

Ehlaq, tê wateya nirxdaraziyên me yên ku di têkiliyên di navbera mirovan de dertêne holê û ku bi <*baş*> yan <*rast*>, yan jî bi ***<xirab>*** an ***<çewt>*** têne binavkirin. Heke em vê danasînê bi awayekî hesantir bibêjin, wê demê em dikarin bibêjin ku ehlaq lêgerîna <*baş*> û <*xirab*> e. Wateya baş û xirab jî, wekî tê zanîn; li gorî şexs û civakan û heta li gorî demê jî diguhere. Ango tevgerek xirab, dibe ku li civateke din ne tevgereke xirab be. Lewra wateya baş û

xirab, guherber e. Bingeha peyva ehlaqê, di erebî de wûşeya *'hulk'*, di yewnanî de *'ethos'* û latînî de jî, peyva *'mos'* e. Peyva *'ethics'* ê ku di zimanê ingilîzî de di wateya *'ehlaqê'* de tê bikaranîn jî, ji *'ethos'* a yewnanî tê. Herwiha, bingeha peyva *'morality'* jî, ku di zimanê ingilîzî de di wateya *'ehlaqê'* de tê bikaranîn; ji *'mos'* a latînî tê.

Rêzikên ehlaqî, nirxdaraziyên me ne û bi demê re, carinan hinek ji wan wê girîngiya xwe ya berê winda dikin û bi temamî ji holê radibin. Lê hinek ji wan; carinan jî dibin rêzikên hiqûqê. Dîsa mirov dikare bibêje ku, ehlaq spontane ye. Ango jiber xwe ve, yan ji xwe xwe re çêdibe, an dertê holê û tişteke, ne çêkirî ye.

Ew pirsên bingehîn yên felsefeyê jî, pirsên weke; ***'gelo wateya mirov çi ye?' 'Divê ku çi be?'*** Û hwd. bivênevê, felsefeyê nêzîkê ehlaqê dike û felsefe dixwaze ku fam bike, gelo armanca tevgerên mirovan çi ne, yan divê ew çi bin û yan jî, kîjan tevgerên mirovan, êdî mirovî û xwedîerdem in?

## 69- Têgeha *'Baş'* di Ramanên Sokrates 'B.Z.469-399' de

Sokrates li hemberî vê îzafiyeta ku ji aliyê Sofîstên hemdemên wî ve hatibû afirandin, radiweste û wisa bawer dike ku ji bo pirsgirêkên jiyana mirovî bi helwdaneke kûr û rasteqîn, mirov dikare xwe bigihîne rastiyeka tevayî *(tumelî)*. Sokrates, wekeheviya *(zanava)* erdem û zanayiyê diparêze, desthilatiya ol û kevneşopan datîne aliyekî û hêjahiya aqil û ramanê, bilind dike. Ew bi awayekî xurt, baweriya xwe bi hebûna rêzikekî tîne.

***Li gorî felsefeya wî:*** Hemû erdem, ji zanayiyê têtin. *Zanayî/episteme mirovan digêjîne tevgera rast û nezanî jî, dibe sedemê tevgerên çewt*. Ji ber vî sebebî çavkaniya tevgerên me yên ehlaqî, dibe zanayî. Li gorî Sokrates, naveroka vê zanayiyê jî, baş e û ew mirovên ku dizanin baş û rast çi ye, ew mirovên xwedîerdem in. Sokrates, têgehên baş, spehî û sûdmendê bi awayekî hemwate bikar tîne. Di sedsala 18an de jî, em rastê hevratiya baş û spehiyê dibin.
***Li gorî nêrîna Sokrates***: *Ew karên/şolên ku alikariya jiyaneka bêazar dikin û xweş in, ew spehî ne. Hemû karên spehî jî, baş û sûdmend in. Jiber ku wiha ye, baş xizmeta armanceke kifş dike. Tu kes, bi hemdê xwe yan bi dilê xwe; naxwaze ku yên xirab e, bike. Lewra, ne li gorî xwezaya mirov e ku yên xirab ji yên baş raser bibîne. Ji başiyê cihêkirina  xirabiyê jî, nîşana zanyarî û xwedîerdemiya mirova ye. Ji xwe, zanayî erdem e û xwedîerdemî jî, zanyarî ye. Ew mirovê ku zanayiyê û riya zanistê bişopîne, dê ew mirov baş û bextewar be. Herweha, yên ku Eudamoniayê jî diafirîne, dilpakijî/xwedîerdemtî ye.*
***Sokrates dibêje ku:*** *'Li wê dera ku rêkûpêkî û guncanî heye, li wê derê baş dertê pêşiya mirov. Lê, li wê dera ku tevlîhevî heye; li wê derê jî xirab dertê pêşiya mirov. Yên ku tiştekî dike baş, rêkûpêkiya wê ye. Heman rewş, ji bo giyana mirovî jî wiha ye.*
*Giyana mirovî çiqasî bi guncan be, dê mirovî jî hewqas bextewar bibe. Mirov, bi bikaranîna aqlê xwe, digihêje guncaniya giyana xwe. Ew <baş> a ku ji zanyariyê tê, mirov bi wê digihêje bextewariyê.'*
Ji ber ku wiha ye, ew dilpakiya *(erdemiya)* ku ji zanayiyê tê *(ehlaqdarî)* û bextewarî, heman tişt in. Sokrates, li ser dilpakijî, zanyarî û bextewariyê, ramanên gelemper pêşniyar dike. Lê tu caran, danesîneka wan ya teqez

*(ferzîne, mitleq)* nade. Yên hewl dide ku yekemîn car wan bide nasandin, bêguman şagirdê wî Platon *(Eflatûn)* e.

## 70- Têgeha *'Baş'* di ramanên Platon 'B.Z.427-347' de

Platon, ji wan lêkolînên Sokratesî yên li ser babeta erdemê bûn, dest bi xebata xwe kiriye. Ji bo xebatên Platon jî, mirov dikare bibêje ku etîka Platon jî bextewarîparêz e. Lewra li gorî Platon jî, başiya herî bilind bextewarî ye. Platon, li wê bextewariyê digere, ku ev yek armanceka mirov a xwezayî ye û dixwaze ku fêhm bike, ka ew çi ye gelo? Platon, di diyaloxên xwe de herdem li ser erdem û bextewariyê rawestiya ye, wan daye nasandin û hewl daye, da ku rêbazên bextewariyê fêrî mirovan bike.

***Li gor felsefeya Platon:*** *Bextewarî (dilşadî, bextiyarî), xwedîtiya başiyê ye. Baş, ew tişt e ku hemû kes wê/wî dixwazin.* Platon dema ku li ser pirsgirêkê hûr dibe, ne şexsan, lê civakê dide ber çavê xwe. Ji zêdetirê mengiya şexsî, ew berê xwe dide mengiya civakî. Platon, ne behsa miroveke gihaştî (kamil, tekûz), lê behsa civateka gihaştî dike.

***Li gor nêrîna wî:*** *Baş a herî bilind, ji yekîtî/tevlîhevbûna zanayî û kêfê pêk tê ku yekîtî/tevlîhevî jî, li gorî pîvana a spehî û rastiyê çêdibe. Erdem; aheng, rastî û rêkûpêkiya rih/giyan e. Xirabî jî, xirabûna vê rêkûpêkî û ahengê ye. Mirov çuqasî xwedîerdem be, hewqasî jî azad e. Lewra rihê mirovekê wiha, ji*

*aliyê aqlê wî ve tê kargerandin. Jiber ku aqlê wî serwer e, ew mirovekê xwedîerdem e, bextewar e, xwedîpîvan û aram e. Ew mirovê ku êsîrê bengîniya xwe ye jî, ew bedbext, serberdayî û ne aram e.*

Platon, dema ku di felsefeya xwe ya gelemper de behsa têgeha ***'Baş'*** dike, mirov dikare bibêje ku ji dazanîna Sokrates behrirehtir li mijarê hûr dibe. Dilêrîna Sokrates ya têgeha baş, di esasê de mirov dikare bibêje ku li hemberî dilêrîna ***Sofîstan*** serhildanek e. Felsefe û dinyabiniya Sofîstan, seranser li ser hîmên berjewendî û li xweşê hatinê hatibû damezrandin.

***Mesela Protagoras wiha digot:*** *<Ez Sofîst im û mirovan perwerde dikim. Ev çend sal in ku ez di nava vê hunerê de me. Xorto! Ger tu li cem min bimînî, dê tu ê ji roja ewilî ve bigoherî û dê tu ê baştir bibî. Her roj, wê tu ê baştir bi pêşve biçî. Tiştên ku wê ez ê fêrî we bikim, ev in: Di karên malbatî û dewletê de têgihiştina hêza kargerandinê û di siyasetê de pêdiviyên bihêzbûnê. Ez ji bona yek tiştekî sozê didim ku wê ez ê, wan mirovên azad bikim mirovên şehraza.>*

Wekî ku xwiya dike; mirovî dibîne ku ***Protagoras t***êgeha ***BAŞ,*** hima hima bi berjewendiyê re wekehev dibîne û vê têgehê, di pratîkê de dike tiştekî kêrhatî. *<Pîvana hemû tiştî, mirov e. Hemû tişt, xwe ji min re çawa bidin xwiyakirin; ew wiha ne. Ji te jî çawa xwiya bikin, ew wisa ne. Ji bo yên ku diqufilîn; ba serma ye. Lê ji bo yên naqufilin jî, ba ne serma ye.>*

***Protagoras,*** bi van gotinên xwe re mirovan weke pîvana hemû tiştî dibîne û rê, li îzafiyetekê nirxî vedike.

Heçî Platon e, ew di ***'Zagon-Yasaya'*** xwe de dibêje: *<Pîvana hemû tiştî, Xwedê ye.>* Û bi vê ramana xwe re jî dixwaze xwe bigihîne mutleqîyeteka nirxî û aheng û

dengeyekê (parseng) bigîhîne jiyana mirovan. Em ramaneka bi vî rengî, li cem ***Demokrîtos*** jî dibînin ku gotibû: *<Ji bo hemû mirovan, heman tişt baş û rast e.>* ***Platon*** ramanên Herakleîtos jî napejirîne, ku gotibû: *<Hemû tişt, di herk û bûyînekê de ne û diguherin.>*

***Platon,*** li hemberî vê yekê nerazîbûna xwe nîşan dide û wiha dibêje: *<Zanayiya tiştekî ku herdem diguhere tune û mirov nikare jê, tu zanayiyan bidest jî bixe.>* Ji ber ku ew jî di dewreka tevlîhev de dijiya, ku di wê dewrê de jî şer û pevçûn hebûn; ew jî di nameya xwe ya VII. ê de dibêje ku: *<Min piştî ku dît hemû tişt bêarmanc dihejin û diguherin, ez ecêbmayî mam û ez bêhêvî mam.>*

Herçuqasî, ew li hemberî ramanên ***Herakleîtos*** radibe jî, lê dîsa jî mirov dibîne ku di felsefeya wî de, ramana guherinê û herkbûna hemû tiştî heye û ev yek, bûye hêza dahfdana felsefeya wî. Lewra Platon dixwaze nîşan bide ku, li pişt wan tiştên guherînek ku herdem diguherin û di herk û bûyînekê de ne; mînak yan hilikek naguher heye.

Platon, navên wan mînakên ku naguher in û her dem wek xwe dimînin, datîne ***Îdea.*** Platon, wek heyîneke li îdeayê mêze dike û li gorî wî, ***îdea*** tiştekî herî rasteqîn e. Di jiyana rojane de, hemû ew tiştên ku em wan dibînin, rastê wan tên an wan dinasin, ew qopyayên îdeayan in. Îdea, li gorî qopyayên xwe rasteqîn in. Lewra qopyayên Îdeayan, girêdayê demê ne û bi demê re jî, ji holê radibin. Lê, ew îdeayên ku em dikarin ji bo wan bibêjin ku ew rasteqîniyên resen in; ew tu caran naguhorin, heyînên bêdestpêk û bêdawî ne. Platon wiha difikire ku, em ancax dikarin di derheqê îdeayan de zanayiyan bidest bixin.

Platon, di wê şibandina xwe ya şikeftê de wiha dibêje: <*Yên ku hemû nesneyan ronî dike, îdeaya baş e. Îdeaya baş, çavkaniya wê ronahî û tava (roja) ku hemû nesneyan ronî dike, ye û ew, çavkaniya hemû zanayî û heyîna ye.’*

**Platon dîsa dibêje ku***: <Îdeaya baş, raserî hemû îdeayên din e.*>
Platon, vê îdeayê di nava wê sînorên dinyaya ku mirov têdigihêjî de dibîne. Mirov, bi hêsanî nikare wê îdeayê bibîne. Ji bo dîtina wê, pêwist e mirov bizanibe ku hemû tiştên baş û delal, jê têtin. Di dinya xwiyakirî de ya ku ronahiyê diafirîne û belav dike, ev îdea ye. Di dinya têgihiştî de jî, rastî û têgihîn, jê têtin. Mirov, ancax piştî dîtina wê; dikarin di jiyana xwe ya hûndirîn û derveyî de, bi zanyarî tevbigerin. Piştra, Platon wê lêgerîna xwe ya başiyê didomîne. Ew têgeha ku ji aliyê hemû kesan ve, li ser navê başiyê lê tê gerîn û wekî miraza jiyanê tê dîtin. Ew têgeha beyî ku bizanibin ew çi ye, bi tenê girîngiya wê hîs dikin. Lewra, ew tiştekî herî bi nîrx, raser û baş e.
Platon, di destpêkê de dev ji eslê têgeha baş berdide û hewl dide da ku beşeka vê têgehê, yeka ku gellekî dişibe wê an hevramaneka vê têgehê ye; ji me re vebêje.
***Li gor nêrîna wî***: Hin tiştên ku hene, ji xwe ew spehî *(delal)* ne û ji xwe, baş in. Lê bi van tiştan re hin nesneyên din jî hene ku, ew jî xwediyê yek heyîneka naguher in. Yanê, xwediyê yek îdeayekê ne.
<*Gellek tişt xwiya dikin, lê nayên têgihiştin. Lê* ***îdea,*** *têne têgihiştin. Lê, ew xwiya nakin.*>
Tiştên ku xwiya dikin, em wan bi hêza dîtinê dibînin. Çavên me çuqasî rind bibînin bila bibînin; ew tiştên ku

xwiya dikin, ew çuqasî rengorengo bin bila bin; heke pergaleka sêyemîn tevlî kar nebe, çav wê wan nebînin û dê ew reng jî xwiya nekin. Ev pergal, jî şewq yan jî roj *(tav)* e.
Platon, rojê weke tayê têgeha baş û beşeka wê dihesibîne.
***<Ew tiştê ku ez dibêjim têgeha 'Baş' aniye holê, ew roj e. Baş, rojê ji bo xwe weke ta afirandiye.>***
Di vê dinya xwiyakirî de ji bo çav û wanekên xwiyakirî roj çi be, di wê dinyaya têgigihiştinê de jî ***BAŞ***, ji bo raman û tiştên ku têne hizirîn ew e. Tiştê ku rasteqîniya nesneyan dide wan û hêza zanînê dide mejiyê mirovî, îdeaya ***Baş*** e. Ji hêla zanînê ve îdeaya baş, çavkaniya rasteqînî û zanistê ye.

Zanist û rasteqîn çuqasî delal bin bila bin, ji vê yekê bawer bike ku ***Baş,*** ji wan êdî raser e. Di dinyaya xwiyakirî de hizra nêzîkbûna şewqê û çavan, rast e. Lê, wan wekî rojê hesibandin çewt e. Mîna vê yekê, li dinyaya têgihiştinî de zanist û rasteqînê wekî ***'Baş'*** ê dîtin çewt e. Cihê ***'baş'*** ê bêguman raserî herduyan e û ji wan gelekî bilindtir e jî.
Platon, têgeha ***'baş'*** mîna sedemê gerdûnê yên resen dibîne û vê têgehê, dike tiştekî mitleq. ***'BAŞ'*** a wî, di heman demê de maneyeka olî û razdar ***(mîstîk)*** jî werdigre. Platon dibêje ku erdem, ne kit e; ew pirr e û ji bo her beşekê rih, erdemek heye.
***Ev erdem jî:***
***1-*** *Sophia - Zanyarî*
***2-*** *Andreîa - Mêrxasî*
***3-*** *Sophrosyne - Pîvanetî*

***4-*** *Dikaiosyne - Rastî*
***5-*** *Osiotes - Xwedîolîtî ne.*
***Zanyarî,*** bi aqil ve girêdayî ye û serwerê giyan *(rih)* e. ***Mêrxasî,*** di demên xeternak an nexeternak û xweş an nexweş de; ew tevgerên me yên ku em wan nîşan didin, e. ***Pîvanîtî*** û rastî jî, erdemên gelemper in û ahenga yekkeriyê pêk tînin.
Platon ***rastiyê,*** weke erdema herî raser dibîne ku ev erdem, hemû erdemên din li cem xwe dicivîne. ***Zanyarî,*** rastiya têgihanê ye. ***Mêrxasî,*** rastiya dil e. ***Xwedîolîtî*** jî, rastiya di navbera me û Xwedê de ye. Hasilê, exlaqa Platon berawajiya Sokrates û dibistanên Sokratesî ***(Sokratparêz),*** civakî ye. Lewra, ew ne tenê li riya berxwîdariya miroveke; lê ew li riya berxwîdariya civakê digere û çawa ku me berê vegot, gerûya (odaxa) vê exlaqê jî, îdeaya ***Baş*** e.

## 71- Têgeha 'Baş' di Ramanên Arîstoteles 'B.Z.384-322' de

Meriv dikare felsefeya ehlaqê ya Arîstoteles, ji berhema wî ***Ethika Nikkomakheia–Ehlaqa Nikkomakhos*** fêr bibe. Etîka Arîstoteles, etîkeke mebestî ye. Ew wiha difikire ku, hemû tişt ber bi ***baş*** ve diqesidin. Ango, ***baş*** ew armance ku hemû tişt, ber bi wê ve diqesidin.
Sincdarî *(rewişdarî, ehlaqdarî ),* ne ew tevgerên me yên ku ji xwe baş in, ne. Sincdarî, ew tişt e ku mirov nêzîkî <*tiştên ji bo başiya mirov in*> dike, ye. Arîstoteles, di ehlaqê de başiyê; bi <*tiştên ku ji bo mirovan baş in*> bisînor dike. Tiştê ku ji bo mirovî baş e, çalakiya biaheng a ku di navbera rih û başiyê de ye.

Li gorî baweriya Arîstoteles jî, mebesta jiyanê bextewarî ye. Belam, li gorî wî bextewarî *(berxwidarî)* ne tiştekî têgihanî ye. Ew tiştekî wiha ye ku mirov encax di hemû jiyanê de dikare xwe bigihînê. Ew cûre çalakiyek e û xweş, bi awayekî xwezayî beşdarê wê dibe. Çawa ku bi yek kulîlkekî û bi yek rojeka bitav, havîn neyête; bi demxweşiyeke kurt jî, berxwidarî nayê. Hasilê, Arîstoteles lêdikole da ku fêr bibe ew kîja jiyan e ku berxwidariyê ava dike.

***Di vê xalê de Arîstoteles, behsa çar (4) hêmanan dike:***

*1- Xweşî*

*2- Şanazî*

*3- Dewlemendî*

*4- Jiyana teorîk.*

Li cem Arîstoteles, ***jiyana teorîk*** ango ***daketina fikirînê***; armanca herî bilind e. Arîstoteles wiha dibêje: <*Armanca hemû çalakiyên mirovan baş in û her çalakî, ber bi başiyê ve diçe.*>

Bi vî awayî, piraniya nirxan *(hêjahiyan)* dertê pêşiya me. Lê, her asta *(derenceka)* heyînê, *'**Baş**'* ekê bilind ya xweser e. Erka *(wezîfeya)* felsefeya ehlaqê jî di vê xalê de, destnîşankirina a ***baş*** e. Berxwidariya mirov ya xas jî, tevgera bierdem e.

Di jiyanê de ew kesên ku xwediyê pisporiyeka diyar in, encax ew dikarin bigihêjin bextewariyê. Bextewarî, çalakiya giyana bierdem e ku jiyaneka pispor didomîne. Xweşî *(haz)* jî, temamker e û encama hemû çalakiya ye. Xweşiya herî bilind jî, bi raman û tevgerên ehlaqî pêk tên. Daxwaza bidestxistina xweşiyê, mîna wek navajoya *(dozîneya)* jiyanê; tiştekî bêgav e.

Belam, bi tenê xweşiya mirovê bierdem, xweşiyekê rasteqîn e. Ji zêdetirê tevgera pratîk, tevgera teorîk êdî mirovî ye. Wekî Platon, Arîstoteles jî nirxên *(hêjahiyên)* giyanî, weke nirxên rasteqîn dibîne û wisa jî, wan dipejirîne. Di dawiyê de Arîsto dibêje ku: '*Bextewarî, encax di wan tevgerên li gor aqil û xwedîerdem de peyda dibe.*'

## 72- Têgeha 'Baş' di Ramanên Stoaparêzan *(Stoîsizmê)* de

Têkiliya me ya bi ehlaqa Stoa re, ji çend hêmanên *(prensîpên)* wan tê, ku berê ji aliyê wan ve hatibûn pêşkêşkirin. Ev hêman jî, ***<vegera xwezayê>*** û ***<guncanîtiya xwezayê>*** bûn ku di sedsala 18an de bîbûn mîna ramanên serwer. ***Zenonê Qibrîsî (B.Z.336-264)*** damezranerê felsefeya Stoa ye û ev felsefe, di heyama ***Hellenîstîk*** de felsefeyeke gelek girîng e. Stoaparêzî, bidestxistina azadiya ehlaqî ya mirovan, ne bi înkarkirina kevneşop û hemû medeniyetê, lê bi siruştîtiyekê *(xwezayîtî)* herî bilind û bi mirovahiyeke rasteqîn, pêkan dibîne. Stoaparêz, hêmana guncanîtiya xwezayê ji felsefeya xwe re dikin hêmaneke bingehîn û bi vê yekê re jî, dibine xwediyê nêrîneka ***pantheîst***. Bêguman, di vê nêrîna wan de ***Herakleîtos*** xwedîbandûr e. Tê gotin ku cara yekemîn felsefe ji aliyê ***Zenon*** û ***Soli Chrysippus*** ve, bi navên vac *(mentîq)*, fizîk û etîkê, bi sê navan hatiye dabeşkirin. Lê giraniya felsefeya ***Zenon***, li ser etîkê *(ehlaqê)* ye.

Ew kesên ku haya wan ji qîmeta nesneyan û di gerdûnê de cih û wateya mirovî tunebe, ew kes nikarin tevgerên bierdem nîşan bidin. Ji ber vê yekê jî, nikarin xwe

bigihînin bextewariyê. Bi vî awayî zanayî, erdem û bextewarî, di dazanîna Stoa de dertêne pêş.

***Li gorî Stoaparêzan:*** Zanayiya rast, rê li tevgera rast vedike. Ango, ji ramana yekîtiya zanayî û tevgerê, derbasî miraza zanyariya ehlaqî dibe. Di dazanîna Stoa de, aqil û xweza wekehev in. Erdem, guncanîtiya xwezayê û aqil e. Ango, li hemberî zagona xwezayê stûxwarkirin, hêmanek bingehîn ya ehlaqa Stoa ye.

***Li gor nêrîna Zenon***: Zanyar, kesên xwedîerdem in û dijberê erdemê, ango xirabî jî li cem wan peyda nabin. Di xirabiyê de, rih ji sebebê zordestiya hêzeka mezin wê yekîtiya xwe winda dike û di encamê de, ji wê rewşa xwe ya xwezayî dûr dibe. Ev yek jî, rê li tevgerên xirab vedike. Zanyar, pêwîst e di daxwaz û tevgerên xwe de ji hestgermiyê dûr bin. ***(apatheia)***

Di dawiyê de mirov dikare bibêje ku ehlaqa Stoa bi wê mengiya xwe ya zanyariyê, ehlaqeke xweser e û dazanîneka şexsî ye.

## 73- Felsefeya Berazan-Felsefeya Berazî

Ev biwêjek e û di felsefeya ehlaqê de, bi taybetî ji bo felsefeyên ku zewq û xweşiyê, weke hêmana *(prensîpên)* bingehîn dibînin tê gotin. Bi taybetî jî, ji bo ***Ehlaqa Xweşiyê a Çawanî*** *(Hedonîzma Çawanî)* yan jî, ji bo Hedonîzma Egoîst *(Xweperest)* tê gotin û bikaranîn.

## 74- Di Felsefeyê de Rêbaza Enduksiyonê

Felsefe ne zanistek e, helwesteke mirovî û çalakiyek ramanî ye. Belam, mirov dikare felsefeyê weke diya

*(maka)* pirraniya zanistan binîrxîne, ku zanistên me yên îroyîn jî jê derketine. Rêbazên ku felsefe wan bikar tîne jî, ji rêbazên zanistan cuda ne. Felsefe, wekî zanistên xwezayê û zanistên civakî, ne xwediyê rêbazên zanistî ye. Belam, ev yek nayê wê maneyê *(wateyê)* ku di felsefeyê de jî ti rêbaz nîn in. Rast e, ku felsefe di laboratuaran de nikare ezmûnan pêk bîne an jî weke hindek zanistên civakî, testan bikar nayne *(nasepîne)*. Rêbaza felsefeyê ji dema ***Arîsto*** ve şeklên birêvebirina mentîq û aqil e, ku Arîsto mentîqê wekî ***organona*** *(alavê-navgîna)* felsefeyê qebûl kiriye.

***Kurte Danasîna Rêbaza Enduksiyonê***

Di vê rêbazê de, yeko yeko ji pêşniyaran destpêkirin û gelemperîkirin *(genelleme)* heye. Li ser bûyerekê bi hejmareke pir zêde *(n)* çavdêrî têne kirin û di dawiyê de, pêşniyara herî gelemper *(tevayî)* tê bidestxistin. Enduksiyon di roja me a îroyîn de, ji aliyê gelek zanistan ve jî bi armanca bidestxistina zanayiyên eqlî, weke rêbazekî tê bikar anîn.

***Lê tiştek heye ku divê mirov vê yekê jî bibêje:*** Encamên ku bi riya enduksiyonê têne bidestxistin, mirov nikare bibêje ku ew ji 100 % encamên misoger *(qutebir)* in, ixtîmala *(dibetiya)* ku ew encamên dibeyî bin jî heye. Heta ku pêşniyarên pêşîn rast derkevin, tu pirsgirêk dernakevin holê. Lê dema ku yek pêşniyarek jî çewt be, wê demê encama ku tê bidestxistin a gelemperî jî, dê çewt be.

***Mînakek bo rêbaza enduksiyonê***

***Çend pêşhatî -pêşane:***

***1-*** *Sifir, lajwerdek/metalek e û dema ku mirov agir dide binê, diperçive.*
***2-*** *Çînko/tûtye lajwerdek e û dema ku mirov agir didê binê, diperçive.*
***3-*** *Alemyon, lajwerdek e û dema ku mirov agir dide binê, diperçive.*
***4-*** *Zêr, lajwerdek e û dema ku mirov agir dide binê, diperçive.*
***5-*** *Hesin, lajwerdek e û dema ku mirov agir dide binê, diperçive.*
***Encam:*** *Nexwe/ku wisa be, hemû lajwerdekên ku têne germkirin, têne perçivîn/baritsin.*
Di mînaka jorîn de ger pêşniyarekê pêşîn çewt be, bêguman dê encam jî çewt derkeve. Lê heke tiştekî wiha pêk neyê, wê demê mirov dikare bibêje ku hemû lajwerdek dema ku têne germkirin, diperçivin.

## 75- Tevgera Ehlaqî di Felsefeya Kant de

I. Kant pirsa *'tevgera ehlaqî çi ye û divê çi be?'* dike û li gor baweriya wî tevgereka ehlaqî, divê ne ji ber hest an jî nêzîkayîtêdanekê pêk hatibe. Divê ji ber ***'hesta erkê'*** pêk hatibe û heke wisa be, ev tevger; tevgereke ehlaqî ye. Hêmanên ehlaqê, ne di nav jiyanê de hatine hilberandin. Ew ji aliyê aqil ve hatine hilberandin û destnîşankirin. Li gor bîr û baweriya I. Kant, armanca tevgerên me yên ehlaqî ne bextewarî ye. Lewra bextewarî, li gor mirovan diguhere û kirdewar *(oznel)* e.
Ji bo yekî, ***'erdem'*** û ji bo yekî din jî ***'baş'*** û ji bo yekî din jî ***'jiyana amizgerê xwezayê'*** ye. Tiştek dibe ku ji aliyê hinekan ve ehlaqî were dîtin û ji aliyê hinekên din ve jî, dibe ku ehlaqî neyê dîtin. Ji bo ku Kant bikaribe ehlaqê ji

vê rewşa kirdewar rizgar bike, ji bo hemû mirovan li bingeheke naguhor geriyaye.
Tiştê ku ji bo hemû mirovan eynî tişt e û naguhor e; ***erk e, xwestina başiyê ye, niyeta baş*** e. Li gor baweriya Kant exlaqitiya tevgerekî ne di şeklê wê tevgerê de ye, belam di dema tevgerê de xwestina başiyê ye. Nîyeta baş e. Mesela yek sirf ji bo ku xelk bila jêre bibêjin ew miroveke baş e qenciyê bike, tevgera wî ne ehlaqî ye.

## 76- Di Felsefeyê de Rêbaza Deduksiyonê

Rêbazekê mentiqî a beravajiya enduksiyonê ye. Di vê rêbazê de, ji pêşniyarek tevayî *(tumel)* tê destpêkirin û di dawiyê de jî, encamên tîkel *(qismî)* têne bidestxistin. Bi pirranî ji aliyê ***Arîstotales*** ve hatiye bikaranîn û dîsa ê ku delk û şeklên biakranîna vê rêbazê destnîşan kiriye, Arîstotales e. Rêbaza Deduksiyonê heta dawiya Serdema Navîn jî, girîngiya xwe parastiye û hatiye bikaranîn. Cihêrengiya deduksiyonê ya ji enduksîyonê ew e ku, encamên ku bi rêya deduksiyonê ve têne bidestxistin, encamên ***misoger (qutebir)*** in. Encam, bi awayekî bêgav ji aliyê pêşhatiyan ve têne destnîşankirin.
***Mînakek bo rêbaza deduksiyonê:***
*'Hemû mirov, bi mirin in.' - Pêşniyara Tevayî -*
*'Sokrates jî, mirovek e.' - Pêşhatî-*
*'Nexwe/ku wisa be, Sokrates jî bi mirin e.' - Encam -*
Ji mînakan jî tê dîtin ku encam bi awayekî bêgav *(bivênevê)*, ji pêşhatiyan derdikeve. Rewşeka beravajiya vê yekê, ji ber ku wê rê li nakokiya aqil veke, dê ne derbasdar be.

## 77- Di Felsefeyê de Rêbaza Dahûrîner *(Analîtîk-Çareserker)*

Ev rêbaza mentîqî, hema hema mirov dikare bibêje ku ji destpêka felsefeyê ve tê bikaranîn. Di vê rêbazê de, hemû *(gişt) (wateyek tevayî),* ji perçeyên xwe yên ku hemûyê anîne holê têne cihêkirin û bi vî awayî lê tê vekolandin. Felsefe dema ku destê xwe diavêje babetekî, we babetê bi hemû aliyan vedikole, lê hûr dibe, yeko yeko wek pêşniyaran ji hevdu vediçirîne *(vediqetîne)* û tiştê ku dixwaze bibêje jî, bi vî awayî dibêje. Di felsefeya hemdem de ev rêbaz gelekî tê bikaranîn, nemaze di warê zimanzanistê *(zimanzanînê de)* xweş tê bikaranîn.

Tiştê ku bi vê yekê tê xwestin jî, jiholêrakirina pêşdaraz, têgihiştinên çewt û pejiraninên qelp e. Ango hilik, naverok, çêbûn, hebûn û têgehên hwd. ji ber ku ji aliyê gelek fîlozofan ve gelek caran hatine vekolandin, ew bi wateyên xwe ên rasteqîn li holê xwiya nakin. Rêbaza dahûrîner wiha dike ku wateya wan ya rasteqîn, çêtir tê têgihiştin.

## 78- Di Felsefeyê de Rêbaza Pêkhêner *(Rêbaza Sentetîk)*

Di vê rêbazê de beravajiya rêbaza ***analîtîk*** *(dahûrîner),* wiha tê fikirîn ku yeko yeko tu wateya perçeyan tune û perçe, encax di nav hemûyê *(tevahiyê)* de dikarin bibin xwediyê wateyekê. Ji ber vê çendê jî, heke em bixwazin pirsgirêkekê bi giştî *(bi hemû hêlên wê ve)* bibînin, wê demê divê em li hemûyê *(tevahiyê)* mêze bikin.

## 79- Di Felsefeyê de Rêbaza Aksiyomatîk

Ev rêbaz, aîdê mentîqê ye û di felsefeyê de jî tê bikaranîn. Di vê rêbazê de têgehek, weke bingeh tê pejirandin û piştî vê domanê *(pêvajoyê),* dest bi hilberandina têgehan tê kirin. Ango, bi vê rêbazê têgeh têne hilberandin. Bi vê yekê wiha tê xwestin ku ji bo cîbicîkirina rewşên taybet, xwe digihînin sîstemeke tevayî. Têgehên ku weke bingeh têne qebûlkirin, dibe ku ew têgehên keyfî bin yan jî, têgehên ku bi riya sehekan hatine bidestxistin bin, ku pêbawer *(bawerpêkirî- ewlemend)* têne dîtin.

Di sedsala 20an de, ji aliyê ***Bernard Russel*** û ***Alfred North Whitehead*** ve ji bo veguhêrandina matematîkê ku dixwestin matematîkê vebihêrînin mentîqê, hatiye bikaranîn.

Di felsefeyê de bikaranîna wê ya herî berbiçav, ji alîyê ***Benedict Spînoza*** ve pêk hatiye. ***Benedict Spînoza***, şeklên pêşniyarên aksîyomatîkê, di pirtûka xwe ya bi navê ***'Etîkê'*** de ji bo pêkanîna felsefeya xwe ya ehlaqê, bi kar aniye.

***Mînakek ji rêbaza Spînoza ya aksiyomatîk...***

*Cewher ji bo berdewama hebûna xwe, ew heyîne ku pêdivîya wê bi tu tiştî tune. [**Danasîn**]*

***Encam 1:*** *Cewher, sebebê xwe ye.*

***Encam 2:*** *Cewher, bêdawi ye.*

***Encam 3***: *Cewher, tekan e û heke dido bûya, dê hevdu bisînor bikirana. [**Deran** / **Îstîdal**]*

## 80- Di Felsefeyê de Rêbaza Diyalektîk

Diyalektîk, rê û rêbazeke fikirînê ye. Bi vê rêbazê, yên nakok yan jî dijber, têne cem hevdu û yekîtiyeke diafirînin *(pêk tînin)*. Di encama vê yekê de jî, pêşveçûnek dertê holê. Cara yekemîn li cem ***Herakleîtos*** hatiye dîtin, di dewra hemdem de jî, ji aliyê ***Hegel*** ve hatiye bikaranîn. Di diyalektîkê de du têgehên dijber, tez û antîtezê pêk tînin û ev du dijber, digihêjin sentezê. Sentez jî, piştra carekê din ji hev dabeş dibe û dibe tez û antîtezeke din a nû û ev pêvajo, her berdewam dike. **Mesela**: Reş *(tez)* û spî *(antîtez)* bila du têgehên dijber bin. Wê senteza wan, cûn *(grî-boz)* be.

## 81- Di Felsefeyê de Rêbaza Danwelidandinê ***(Rêbaza Mayotîkê)***

Ev rêbaz, ji aliyê Sokratesê navdar ve hatiye bikaranîn. Sokrates wiha bawer dike ku mirov, ji zayîna xwe ve xwediyê zanayiyê ne û ger ji wan pirsên rast û dirist werin pirsîn, ew xwediyê wê danehevê ne ku wê bersivên rast û dirist bidin. Bêguman, di vê xalê de mirov dikare bibêje ku Sokrates baweriya xwe, bi celebek reenkarnasyonê tîne. Sokrates ji rêbaza xwe gelekî bawer e û li pêşiya komek mirovan, rojekê vê yekê diceribîne jî. Koleyekî hildibijêre û li pêşiya hemû mirovan, jê pirsên ku bi ***sêqoşeyê*** re têkildar in dipirse. Wiha dike ku sêqoşe tê bîra wî koleyî. Lê hemû pirsên Sokrates, weke belê/erê, yan jî wek nexêr/na têne bersivandin. Ji ber vê çendê jî, ev rêbaz weke rêbazeke bişik *(biguman)* hatiye nîrxandin.

## 82- Li Gor Nêrîna Sartre Azadî û Berpirsiyarî

Mirov heyînek ji bo xwe ye, hiş û azadî ye. Sartre vê ramana xwe û bivênevêtiya azadiyê, bi hevoka <*mirov, mehkûmê azadiyê ne.*> şirove kiriye. Em di bin kîjan şert û mercan de bin bila bin, em azad in û bi biryarên xwe, em jiyana xwe diafirînin. Helwesta me ya ku em ji bo rewşekî nîşan didin, bi pêşnûmayên me yên ji bo siberojê re digihêjine wateyekî û tevgerên me jî, li gor wan pêşnûmeyan derdikevine holê. Azadiya giştî, bi xwe re berpirsiyariya giştî tîne. Jiber vê yekê jî mirov, hem ji xwe û hem jî, li hemberî hemû mirovan berpirsiyar e. Hilbijartina li hember rewşekî jî, di destê me de ye. Biryara vê yekê, em bi xwe didin. Hilnebijartina tiştekî, di rastiya xwe de hilbijartina tiştekî ye û divê *(em bêgav in)* em hesabê vê yekê jî bidin.

Di dema hilbijartina rewşekî de em ne jiyana xwe tenê, em di heman demê de hêman û hêjahiyên xwe jî, ku bingeha wê hilbijartina me ne, destnîşan dikin û pêşkêş dikin.

Mengiyên *(îdealên)* ehlaqî û hêjahiyên me, bi tenê dikarin li ser azadiya me werin hîmdarkirin. Mehkûmtiya mirovan, ya azadiyê û têgihiştina mirovan ya berpirsiyariya xwe, diltengiyekî jî derdixe holê û diltengî jî, ji hestên herî bingehîn yên hebûna mirovî ye.

## 83- Heyîn di Felsefeya Parmanîdes *(B.Z. 515-460)* de

Heyîn heye, tunebûn tune.

Ev pêşniyara wî ya bingehîn e û Parmanîdes aşharîşên vê pêşniyarê wiha şirove dike:

***A-*** *Ger ku tiştek hatibe hebûnê/heyînê, divê ew tişt yan ji heyînê, an jî ji tunebûnê hatibe holê. Heke ew ji heyînekê*

*çêbûbe, wê demê di vê yekê de bûyînek tune. Lewra, tiştekê ku ji heyînekê hatibe holê, ji xwe ew tişt hebûye û tişteke ku hebe jî, carekê din ew nayê holê. Lewra, ew tişt ji xwe heye.*
***B-*** *Na, ger tiştek ji tinebûnê çêbûbe; divê tunebûn jî berê tişteke heyînî be, yan tunebûn jî heyînek be, da ku heyîn bikaribe jê çêbibe û derbikeve holê. Ev jî, nakokiyek e. Heyîn, ne jî hebûnê û ne jî, ji tunebûnê çêdibe. Lewra, ew her heye.*

## 84- Felsefeya Ludwig Wittgenstein

Wittgenstein ***(1889-1951)*** ramanwerekî navdar ê felsefeya ziman e û hemû pirsgirêkên felsefeyê, wekî pirgirêkên zimanî dîtiye. Xeyala wî ew bû ku zimanekî mantiqê ava bike û bi vî zimanî, hemû tiştî bi awayekî misoger *(teqez)* îfade bike. Xwediyê du kitêba ye û di kitêba xwe ya yekemîn de, digot min hemû pirsgirêkên felsefîk *(felsefeyê)* safî kiriye. Piştra jî, notên xwe yên felsefeyê weşandî ye. Li gor baweriya Wittgenstein, ziman wêneya dinyayê ye. <*Çawa ku heyîn ji atoman pêk tên, ziman jî wisa ji hevokan pêk tê û hemû pêkhatinên li dinyayê, dikarin bi riya zimên, yeko yeko werin resmandin.*> Piştra vê ramana xwe sererast kiriye û gotiye ku ziman ne wekî wêneyekî, lê wekî alav *(aletekî)* ye. Bi rêya fêrkirina rast ya bikaranîna zimên û raxistina holê ya çewtiyên zimanî, dê pirsgirêk safî/çareser bibin. Divê mirov li zimên, di çerçoweya wî ya xwezayî de hûr bibe. Qasî wateya gotinê *(hevokê),* girîngiya ê/a ku ew dibêje jî heye. Karê felsefeyê ew e ku ramanan, bi awayekî mantiqî rohnî bike. Felsefe ne dazanînek, bêtir çalakiyek e. Felsefe divê dev ji pêşkêşkirina dozîne *(quraman)* jî berde. Çimku ev

yek ji bilî şîlokirina mejiyên mirovan, bi kêrî ti tiştî nayê. Herweha babetên metafizîkî jî, nikarin werin zanîn û divê felsefe, dest ji wan jî berde. Di dawiyê de jî gotiye ku: <*Tiştên ku em nikaribin li ser wan bipeyîvin, divê em wan ji bêdengiyê re bihêlin.*>

## 85- Ramana Xwedê di Felsefeya Descartes de

Descartes dibêje ku ew bingeha ku lê digeriya bi saya **<Rêbaza Şikber>** û bi pêşniyara <*Difikirim, nexwe ez he me-Cogito ergo sum*> derketiye holê. Encax bi tenê hebûnatî, têra misogeri û zelaliya zanayiyê nake. Lewra mirov dema ku difikire, ev yek tê wê wateyê ku hê jî di bin bandora wî cinî ku Descartesî qala wî dikir, de ye û bandor berdewam e. Nexwe divabû ku Descartes di nav ramanên xwe de tiştekî wiha bidîta ku bi awayekî eşkere ev yek ji dereka din bihatana.

Ev yek jî, ramana Xwedê ye. Ramana Xwedê ya teqûz, jiber ku ne hilbereka ramanên wî ye, ev yek tê wê wateyê ku pêzanîna Xwedê, bi tenê jiber Xwedê ye. Heger ramana Xwedê li cem mirovî bi tenê xeyalek bûya, wê demê ji ber ku mirov zîndiyek dawîndar e; dê ramana Xwedê jî ramanek dawîndar bûya. Ev yek jî, rewşeke nakok e.

*Ê baş e Descartesî çima wisa xwe bi ramana Xwedê ve girê dide?*

Lewra heke Descartesî bikaribe bipeyîtîne ku mirov dikare li Xwedê bifikire, wê demê dê di nav sînorên

***<Difikirim, nexwe ez he me.>*** de nemîne û wê demê ji bilî xwe, dê bikaribe bi nesneyên/wanekên din jî bizanibe. Ango, dê bikaribe derbasî cîhana nesneyan *(wanekan, heyberan)* jî bibe.
Bi fikra Xwedê, Descartesî xwe ji wê rewşa neyînî a ku şikê *(gumanê)* rê didayê, rizgar dike. Heke bi tenê bigota ***<Difikirim, nexwe ez he me.>*** wê demê nikaribû ji şikê xwe rizgar bike û derbasî cîhana nesneyan bibe, derheqê wan de zanayiyan bidest bixe. Hasilê: Descartesî wiha bawer kiriye ku mirov ji zayîna xwe ve, xwediyê behreya *(qabilîyeta)* zanînê ne.

## 86-Mijar û Pênaseya Ciwannasiyê

Ciwannasî/Estetîk, di sedsala 18an de ji aliyê ***A. G. Baumgarten*** ve hatiye damezrandin. Peyva ***<estetîkê>*** ji peyva ***<aisthesis>*** a yewnanî tê û wateya wê ***<têgihîna 'bîrbîrî, îdraq' sehekî>*** ye û mijarên wê jî, zanayiyên têgihîna sehekî ne. Li zanayiyên têgihîna sehekî vedikole û dixwaze ku fam bike, ka ew ji kû derê tên? Lê mirov dikare bibêje ku estetîk, ne li hemû zanayiyên têgihîna sehekî, lê bi tenê li zanayiya bûyera spehîtiyê *(delaliyê, bedewiyê)* digere. Dîsa di sedsala 18 an de ***Immanuel Kant,*** estetîkê wekî ***<zanista delkên hestyariyê>*** daye nasandin. Spehîtiya ku babeta estetîkê ye, ne tenê ew spehîtiya hunerî ye. Hemû spehîtiyên ku di xwezayê de hene mijarên estetîkê ne, ji lewma jî; ji vê felsefeyê re, ***<felsefeya spehîtiyê/delaliyê>*** tê gotin.

Ji Platon bigirin heta Hegel, dema ku mirovî li dîroka felsefeyê mêze dike, mirov dibîne ku di bingeha nêrînên

estetîkî de têgeha 'spehî' û 'spehîtiyê' heye. Ji şaxê felsefeyê ya ku li spehiyê (delaliyê) dipirse û vedikole re, ***Ciwannasî (Estetîk)*** tê gotin.
Felsefeya ku li hunerê û berhema hunerî dipirse, vedikole û ji bo hunermendan pîvanên nîrxandinê tîne re jî, 'Felsefeya Hunerê' tê gotin. Ango, Ciwannasî û Felsefeya Hunerê, ne di heman wateyê de ne. Lê carinan di hindek axaftinên mirovan de, em dibînin ku di heman wateyê de têne bikaranîn. Lê ew gotin, bikaranîneke çewt e. Lewra, ne heman tişt in. Wekî mînakekî: Spehîtiyeka di xwezayê de, em bibêjin Geliyê Elî Beg, dikare bibe mijara estetîkê. Belam, helbesteka helbestvanekê û romaneka nivîskarekê, encax dikare bibe mijara felsefeya hunerê.

### 87- Pirsgirêka Spehîtiyê / Delaliyê

Spehî *(delal)*, yek ji wan nîrxên estetîkî ê sereke ye. Spehî, ji hêla estetîkê ve hêja ye. Dîmenek spehî, filîmek spehî, leyîstikek spehî. Spehîtî hem di xwezayê de û hem jî di hunerê de he ye. Dema ku em dibêjin jineka spehî, dîmenek spehî û dema ku em dibêjin muzîkeke spehî û wêneyeke spehî, wateya spehiya ku em bikar tînin cihêreng e. Di ya yekemîn de delaliya rasteqîniyeka li derveyê mirov tê vegotin û di ya duyemîn de jî, delaliya ku ji layê hest, coşî û bîra hunermend ve hatiye afirandin, tê vegotin. Li gor nêrîna ***Platon*** spehîtî, îdea ye. Heyînên ku di cîhana sehekî de ne, çiqasî ku ji îdeayan para xwe werbigirin, hewqasî spehî dibin.
***Arîstoteles*** jî têgeha spehîtiyê bi pîvanên nesnel şirove dike. Li gor Arîstoteles, tiştê ku ji hêla matematîkî ve xwedîpîvan e, rêk û pêk û hevgirtî ye, ew spehî ye.

Li gor ***Plotinosî*** jî spehîtî form e. Ev form, xwe berdide madeyê û yekîtiya xwe dide wê. Delal; di laş de xwiyakirina giyan, di giyanê de xwiyakirina aqil û di aqil de xwiyakirina Xwedê ye. Ango, di heyînên gerdûnî de weke şewqeke dengvedana Xwedê ye. Mirov vê nêrîna Plotinos, li cem ***Hegel*** û ***Schopenhaur*** jî dibîne.

Li gor nêrîna ***Hegel***; spehîtî, xwiyakirina giyana tekez *(Geîst- Xwedê)* e û bi sehekan, tê têgihiştin.
Li cem ***Schopentaur*** jî spehîtî, di heyînên gerdûnî de dengvedana îradeya mitleq e, di heyînên cîhanî de rasterast xwenîşandana îradeya mitleq e û bi awayekî eşkere, xwe dane wê ya der e.
Li gor ***Kant*** jî, spehîtî ew tişt e ku bêmenfeet li xweşê mirov diçe. Tiştekê spehî li xweşê mirovan diçe, lê ev xweşî ne xweşiyeka menfeetperest e. Taybetmendiyeka din jî ya spehîtiyê ew e ku ew li xweşê hemû kesî diçe, ye.

## 88- Pirsgirêka Têkiliya Spehîtî û Heqîqetê

Têgeha heqîqetê *(rastî)* li derveyê heqîqeta mentîqî *(bûyerî),* di wateya heqîqeta metafizîkî de ye. Rastîya bûyerî-mentîqî, rastiya pêşniyaran tîne zimên. Rastiya *(heqîqeta)* metafizîkî jî, bi têgihiştina hilika *(naveroka)* heyînê re têkildar e. Li gor nêrîna Platon spehîtî û rastî, heman tişt in. Li gor nêrîna ***Plotinos*** û ***Hegel*** jî, spehîtî û rastî heman tişt in. Lê, ***Kant*** van herdu têgehan ji hevdu cuda dike. Li gor baweriya ***Kant***, rastî nirxekî mentiqî-zanistî ye. Ew aîdê warê zanistê ye. Spehî jî, nîrxekî sehekî ye û aîdê warê ciwannasiyê *(estetîkê)* ye.

## 89- Pirsgirêka Têkiliya Spehîtî û Başiyê

Li gor Platon Spehî û baş *(qenc, pak, rind, çak),* heman tişt in. Spehî, baş e û baş jî spehî ye. Çavkaniya herduyan jî, îdeaya baş e, ku ew jî li gerdûna îdeaya ye. Nivîskarê ***Urûs Lev Tolstoy*** jî, ramaneka ku dişibe vê ramanê dipejirîne û dibêje: *'Hunera, ku ehlaqê me xurt neke û bi pêşve nebe, ew ne tu huner e.'*

Li gor dijberên vê ramanê jî, divê ehlaq bikeve bin xizmeta hunerê û ji bo spehîtiyê, heke pêwist be divê ehlaq jî were fedakirin. ***Kant,*** têgeha spehî û baş, ji hevdu cuda dike û wateyên cihêreng li wan bar dike. Delal, nîrxeke estetîk e û bi hestên me re têkildar e. Baş jî, nîrxeke ehlaqî ye û bi tevgerên me re têkildar e.

## 90- Pirsgirêka Têkiliya Spehîtî û Xweşiyê

Hinek dilêrînên hunerî, têgeha ***<spehî>*** û ***<xweş>*** ê, wekehev dibînin. Ji vê nêrînê re ***<Hedonîzma Estetîk>*** tê gotin. Li gor vê dilêrînê, spehî ew tişt e ku xweş e û xweşiyê dide mirovan. Lê hemû tiştên xweş, ne spehî ne. Di vê babetê de Kant, têgeha spehî û xweşiyê, ji hevdu cuda dike û cihêreng dibîne. **Kant** dibêje; 'xweşdîtin/ecibandin asta şexsî îfade dike, lê spehî ji şexsitiyê xwe rizgar dike û ber bi ecibandineka hevpar ve diqeside.'

## 91- Têkiliya Spehî û Gewremendiyê

Gewremend *(berz/bilind)* jî, weke spehîtiyê têgeheke *(têgîneke)* ciwannasiyê *(estetîkê)* ye. ***Arîstoteles*** yên ku gewremend *(berz)* in û yên ku spehî ne, ji hevdu cuda

dike. Li gor baweriya ***Arîstoteles*** çiyayên bilind, gewre *(berz)* in û mirov nikare wan bi têgeha spehî biwesfîne. Spehîtî bi nesneyê re têkildar e û darazên bisînor û kifş, îfade dike. Li cem yê spehî rêkûpêkî, hevgirî û aheng, heye. Bi têgeha berz *(bilind)* re jî, bêsînortiyeke ku ji sînoran derbas dibe û bêdawîtiyek tê derbirîn. Fîlozofekî din ê ku têgeha gewre *(berz)* û spehiyê ji hevdu cuda kiriye, dîsa ramanwer ***Kant*** e.

## 92- Li Ser Pênaseya Hunerê

***1- Hunera Bi Awayê Texlîdî: <Huner Texlîd e.>***

Li gorî vê nêzîkayîtêdanê huner, bi texlîda hunermend pêk tê. Hunermend tiştekê ku dibîne, yan jî rasteqîniyeke texlîd dike. Di serdema pêşîn de ***Platon*** û ***Arîstoteles,*** ji hunerê re gotine ***<mîmesîs>*** ango, texlîd. Huner, di encama texlîdkirina hunermend de dertê holê. Li gor bîr û baweriya ***Platon,*** tiştê ku resen e *(esas e, bingehîn e)* îdea ne. Dinyaya ku em têde dijîn jî, dengvedan, sîh û kopîyeka *(jêgirtineka)* îdeaya ye. Li gor Platon hunermend divê tiştên xwiyakirî bibîne, ji wan tiştên xwiyakirî derbasî îdeayan bibe û wan texlîd bike ku îdea mînakên yekemîn yên nesneyan in.

Li gor ***Arîstoteles*** jî, hunermend xwezayê texlîd dikin, ew texlîdkar in. Hunermend dikare herdem rasterast xwezayê texlîd bike û dikare li gor awira xwe jî wê vebiguhezîne. Dîsa ***Arîstoteles*** dibêje ku li gor awayê texlîdkirina tiştan, mirov dikare hunerê bike lod jî.

***2- Hunera bi awayê afirandinê: <Huner afirandin e.>***

Li gor vê nêzîkayîtêdanê, huner xebata lêgerîna baş, xweş û tekûzê ye. Di xwiyakirina xwezayê de tekûzî tune û hunermend jî nikare bi alîkariya xwezayê yên tekûz biafirîne. Hunermend bi tenê, bi alîkariya bikaranîna hêza xwe ya xeyalî dikare yên îdeal biafirîne. Babeta hunerê, yên îdeal in. Li gor bîr û baweriya ***Benedetto Croce,*** huner afirandin e û naşibe tu xebatên mirovî. Çimku huner, çalakiyeka azad e. Ev çalakiya azad jî, tê wateya serxwebûna takekesîtiyê.

***3- Hunera bi awayê leyîstikê: <Huner leyîstik e.>***

Li gor vê nêzîkayîtêdanê huner, leyîstik e û ew gelekî dişibin hevdu. Armanca hunerê û ya leyîstikê jî, di nava *(hilika)* xwe de ye. Herdu jî ne li pey berjewendiyeke ne. Herdu jî mirovî ji tengasî û acizbûnên *(sitresên)* rojane rizgar dikin û ber bi dinyaya azad ve dibin. Ev raman ji aliyê ramanwerê alman ***F. Schiller*** ve tê parastin. Li gor ramana ***Schiller;*** *'mirov heta ku dileyîze, mirov e.'* Di peyva leyîstikê de, qesda wî huner e. Lewra herdu jî mirovan, ber bi azadiyê ve dibin.

## 93- Pirsgirêka Hebûna Darazên Estetîk yên Hevpar

***Gelo darazên me yên estetîk ên hevpar hene yan na?***

Li gor hinek ramanweran, zewq û ecibandinên mirovî, guhêrbar e. Yên ku ji heman muzîkê hez dikin jî, dikarin hunermendên cuda hilbijêrin. Ev yek jî nîşanî me dide, ku darazên estetîk yên hevpar tune nin. Li gor hindek ramanweran jî, di babeta spehîtî yan ne spehîtiya berhemeka hunerî de, hesteka hevpar ya ecibandinê

dikare pêk were. Wek mînak: Mirovên ku li tabloya ***Leonardo Da Vinci*** ya ***<Mona Lisayê>*** mêze dikin, li cem wan hesteka ecibandinê peyda dibe û tabloyê diecibînin.

***1- Ramangirên Ku Hebûna Darazên Estetîk Yên Hevpar Napejirînin:*** Li gor vê nêrînê, zewqa *(eciban)* hemû mirovan cihêreng e. Çavkaniya wê zewqê jî, dinya wan ya hundirîn e. Ji ber vê çendê jî, zagoneka ku ji bo hemû mirovan bikaribe bibe pîvana ecibandinê, tune. Her eciban, li gor xwe derbazî/derbasdar e. Û ji ber ku darazên estetîk subjektîf in, darazên estetîk yên hevpar jî tune nin. Ev raman ji aliyê ***B. Croce*** ve tê parastin.

***Li gor bîr û baweriya Croce:*** *Hunermend berhema xwe ya hunerî bi hêza xwe ya xeyalê û di encama têgihiştin û feraseteke de diafirîne. Huner û berhema hunerî ji ber ku hilbera bîra hunermend ya resen e û ji wê derê der diçe, ne gengaz e ku di vê xalê de darazên hevpar derkevin holê.*

***2- Ramangirên Ku Hebûna Darazên Hevpar Dipejirînin:*** Fîlozofê sereke yê ku vê ramanê dipejirîne, ***Arîstoteles*** e. Li gor ***Arîstoteles*** spehîtî; yekîtiya aheng, hevgirî û pîvanê ye. ***Arîstoteles*** van têgînan *(têgehan),* wekî darazên estetîk binav dike. Belam ramanwerê ku bi awayekî sîstematîk hebûna darazên estetîk şirove kiriye, ***Kant*** e.

Li gor baweriya ***Kantî***; dema derheqê objeyekê de were gotin ku ew spehî ye, divê ev daraz ne ji bo min tenê, ji bo yên din jî derbasdar be.

***Kant wiha dibêje:*** *'Dema ku ez li filîmekî temaşe bikim û wê spehî bibînim, divê mirovên din jî wê spehî bibînin. Lewra xîmê daraza estetîk, hesta ecibanê/zewqê ye û ev hesta ecibandinê jî, ji hesta estetîk ya hevpar der diçe, ku li cem hemû mirovan heye.'*

Herweha ramanwerên ***Platon, Plotinos, Hegel*** û

***Schopenhaur*** jî, jiber ku spehîtiyê wekî dengvedana heyîna kit û rasteqîn dibînin, ew jî baweriya xwe bi darazên estetîk yên hevpar tînin.
Di vê babetê de ramanwer ***Fechner*** jî, di lêkolînên xwe de xwestiye ku rastiya vê yekê derxe holê û bizanibe ka darazên estetîk hevpar in yan na? ***Fechner,*** xwestiye ku di vê babetê de xwe bigihîne bingehekê. Ji bo vê yekê jî Fechner li ser şeklên herî zewqdar *(xweşik)* rawestiya ye û li ser vê yekê ceribandinan pêk aniye.
Di lewnên *(şeklên)* cihêreng de, ji mirovan re zerfên nameyan bi rê kiriye û ji wan xwestiye ku ya herî xweşik *(zewqdar)* hilbijêrînin. Bersivên ku hatine dayîn jî, bi awayekî îstatîstîkî nîrxandiye û xwestiye ku bi vê yekê re xwe bigihîne şeklên herî xweşik yên hevpar.

## 94- Gelo çima Descartes gotiye ku 'difikirim; nexwe ez he me?'

Şika Metodîk: Rêbaza şikê ya ku Descartes ew bikar aniye, li Ewropayê û li hemû dinyayê, ramana nûjen xistiye bin bandora xwe û bûye rêbazeke baş ya hilberandina zanayiyê.
Descartes wiha gotiye:
**1-** Em bibêjin ku ez di xewnekî de me û cinekî ku dikare hemû tiştî bike, min dixapîne. Mesela em bibêjin ku ew heyberan/nesneyan, bi awayekî cihêreng nîşanê min dide. Encax ez di xewn de bim jî, wiha bifikirim ku ez ji layê cinekî ve tême xapandin jî; yê ku tê xapandin û nesneyan cihêreng dibîne, dîsa ez im.

**2-** Şikkirin, pêhisîn û tirsîn û gelek tiştên din, fikirîn e. Heke şikkirin, fikirîn be û yê ku di şikê de ye jî ez im; difikirim; nexwe ez he me. (Cogito ergo sum.)
Descartes berî her tiştî dixwest ku xwe bigihîne binegeheke zexim û bi vî awayî xwe ji hemû gumanan xilas bike. Heke hebûna min ji şikê dûr be, ramanên min yên ku ez wan tînim zimên jî; dê ji gumanê dûr bin. Lewra, ji ber ku wê ew jî ji hebûna min der biçin, wê ne gumanbar bin. Li gor Descartesî, bi vî awayî pêkan e ku mirov xwe bigihîne zanayiya rast û misoger, weke zanayiya matematîkî.

## 95- Heyîn di Felsefeya George Berkeley de

Li gorî bîr û baweriya ***George Berkeleyê (1685-1753)*** metran ku mirovekî îngilîz e, heyîn têgihîştin *(bîrbirin, serwextbûn)* e û li derveyê têgihîştin e û ramanên me jî, made tune.

***Berkeley*** di pirtûka xwe ya bi navê ***<Treatise on the Princivles of Human Knowledge> (Lêkolîna Li Ser Hêmanên Zanayiya Mirovî 1970)*** de li ser vê babetê wiha dibeje: *<Hemû kes dizanin ku pêşnûma, beyî zêhma mirovî tune nin û nikarin hebin jî. Herweha hinek tiştên ku em bi wan dihesin hebin jî, em dîsa dizanin ku ew li derveyê zêhna me nikarin hebin.>*

Heke em baş bi gotina ***<hebûnê>*** bizanibin, wê demê em ê çêtir têbigihêjine gotinên wî: Dema ku ez dibêjim ***<ev maseya ku ez li ser dinivîsînim>***, di vê gotinê de armanca min ew e ku ez dixwazim bibêjim ku ez çav bi masê dikevim û destê xwe lê didim. Wekî vê yekê bêhnek hebû,

jixwe ez bi bêhnê têgihîştimê; dengek hebû, ez bi deng têgihîştimê.

***Eşkere ye: ya ku di vir de heye, a ku hatiye têgihîştin e.***

***George Berkeleyî*** bi vê angaşta xwe, li hemberê madeperestiyê *(materyalîzmê)* têkoşiyaye. ***Berkeley ji xala ku dibêje:*** *<nesneyên fizikî pêşnûma ne.> dest pê dike û dibêje <pêşnûma jî bi têgihîştinê dikarin hebin û ji ber vê yekê jî, nesneyên fizikî; ji bilî têgihîştinê ne ti tişt in.>*

Dîsa di pirtûka xwe ya bi navê <*Three Dialoques Between Hylas and Philonous - Sê Gotubêjên di navbera Hylas û Philonousî de*> de jî, vê ramana xwe berfirehtir dike.

Di vê pirtûka xwe de jî dibêje ku <*gerdûna ku em têgihêjinê, ew gerdûn e ku em bi sehekên xwe têdigihêjinê. Herweha, ji bilî sehek û pêşnûmeyan, ti tişt nikare were têgihîştin û ti pêşnûma, ji bilî zêhna me; li ti dereka din nikare hebe jî.*>

## 96- Xweza di Felsefeya George Wilhelm Friedrich Hegel de

Di ramanên George Wilhelm Friedrich Hegel (1770-1831) de xweza, îdeyek e (heyîna teqez e) ku ji xwe der çûye û cihêreng bûye. Têgeha îdeyê ku têgehek razber/nedîtbar (soyut) û cihêreng e, yeko yeko vediguhere heyînan, ango dibe heyîn û bi vî awayî jî dibe heyînek, dibe heyînek ji derveyê xwe. Ji ber vê çendê jî yekîtiya îdeyê, di xwezayê de bi awayekî eşkere xwiya nake, xwe vedişêre û nûxamtî ye, lewma jî em di xwezayê de piraniyê dibînin. Herweha heyînên yeko yeko yên ku di xwezayê de hene; hebûna xwe ji xwe wernagirin, ji

îdeyê werdigirin û bi îdeyê re jî bi temamî ne guncan in, di navbera wan de lihevhatinek berbiçav jî tune.

*Jiber vê yekê jî, di xwezayê de herdem dibetiyek li ser kar e.Derketina derêxwe ya îdeyê ku dibe bîyaniyê xwe, di xwezayê de tê dîtin. Heyîna teqez (heyîna mitleq) ji bilî xwe, li derveyê xwe dibe heyînek û dibe bîyaniyê xwe.*

Di ramanên Hegel de bingeha ramana bîyanîbûnê, ku piştra di felsefeya Marksîst de bûye xwediyê cîhekî girîng, ji vê niqteyê tê. Serê binî yê xwezayê ew îde ye ku bi temamî bûye bîyaniyê xwe û wisa jî, xwe daye der.

*Serê jor (raser) jî nîjada mirov e ku xwedîaqil e û têdigihêje hişmendiya xwe. Nîjada mirovî jî; di xwezayê de dertê holê, û di xwezayê de dibe heyîn. Lê mirov hêdî hêdî xwe ji xwezayê dûr dike, digihêje bîra/hişê xwe, ber bi îdeyê ve (heyîna mitleq) ve diqeside, têdigihêjê û bi vî awayî, ew bîyanîbûn û xwe xerîbdîtin, ji holê radibe. Careke din, digihêje yekîtiyê.*

Ango yekîtiya teqez; di ramanên mirovî de carekê din tê têgihiştin, ji nû ve tê raxistin. Bi vegotineke din xweza, kedeka mezin e û dixwaze ku bigihêje bîra xwe û koka xwe binase. Herweha armanca felsefeya xwezayê jî, şirovekirin û destnîşankirina vê berfirehbûnê ye ku gav bi gav pêk tê.

## 97- Li Ser Nêzîkayîtêdana ku Heyînê Weke Buyînê Dibîne

Fîlozofê pêşîn yê ku vê angaştê parastiye, ***Herakleîtos*** e û li gorî nêrîna wî dêmadeya/hilika heyînê, agir e. Gerdûn, bêrawest diguhere û di rewşeka herk û çêbûnê de ye. Di gerdûnê de ti tiştê rawestî û naguher, tune. Li

ser vê mijarê, Herakleîtosî gotiye ku *'Mirov, nikare xwe du caran di çemekî de bişo.'*
Herweha guherîna ku di gerdûnê de pêk tê jî, wiha ne serberdayî ye. Tiştê ku hemû tiştî dike rêz û rêkûpêkîtiyeke dide gerdûnê, ***<Aqilê gerdûnî- Logos>*** e û di gerdûnê de, bandêra yekîtiya dijberan heye. Mesela: jiyan, ji nêr û mê, pêk tê; xwarina giyayê, rê li jiyana pez vedike. Baş- xirab, ronahî- tarîtî, şer û aşitî, encamên pêvçûnê *(lihevxistinê)* ne.

Bi vê ramana xwe re, kesê ku cara yekemîn dîyalektîkê bikar tîne; dîsa ***Herakleîtos*** e. ***Herakleîtos***, bi ramana xwe ya ku dibêje hemû tişt tişt diguherin, ya ***Sofîstan*** û bi ramana xwe ya ku dibêje gerdûn ji aliyê aqlê gerdûnî ***(logos)*** ve tê îdare kirin, ya ***Stoaparêz*** û ***Panteîstan***; bi nêzîkayîtêdana xwe ya Dîyalektîkê re jî, ya Hegel û Marx, xistiye bin bandûra xwe. Di destpêka Sedsala 20- an de ***E. Mach***, ramanên xwe yên di derbarê heyîn û gerdûnê de pêşkêş kiriye û gotiye ku; *<Di gerdûnê de hemû tişt têne guherîn. Tiştê ku naguhere jî, westariya/neguhêzbariya guherînê ye.>* Li gorî ***H. Bergson*** jî dinya, herdem di nav guherinekê de ye. Bergson, vê guherînê jî bi navê ***<Hilpişkîna jiyanê>*** binav dike. Hilpişkina jiyanê, di babeta çêbûn û guherînê de, nîşana rêkûpêkitiya gerdûnê ye. ***Whitehead,*** wiha dipejirîne ku heyîn çêbûn e û li hember nêzîkayîtêdana statîk ya heyînê radibe û dibêje ku, gerdûn herdem diguhere û di nav çêbûneka bêrawest de ye. Ji bo têgihiştina heyînê, berê her tiştî divê em berê xwe bidine xwezayê. Xweza ne heyîneke çêkirî, statîk, mekanîk û razber *(soyut)* e. Xweza, pêkhatineka zindî ye.

Di nav vê pêkhatinê de jî, hemû tişt bi hevdu re têkildar in û girêdayê hevdu ne. Hemû tiştên ku xwezayê pêk tînin, hebûna xwe deyndarê hinekên din in. Du taybetmendiyên xwezayê hene ku ew jî afirandêrî û sereqetî *(berdewamî)* ne.

## 98- Li Ser Huner û Zanayiya Hunerî Çend Gotin

Huner; bi awayekî estetikî û bi şeklên cîhêreng, îfadekirina hest, raman, pêşnûma an jî spehîtiyekê *(delaliyekê)* ye. Bi awayekî cihêreng, şekildan û dîmendarkirina yên spehî ye. Mesela wêneya wênesazekê, helbesta helbestvanekê, romana nivîskarekê, bûyera hunerî ye. Di vê afirandinê de, em dibînin ku estetîk û spehîtî, dertêne pêş. Hilberandina hunerî, bi awayekî kûr; bi têgihiştina gerdûn û jiyanê re têkildar e.

Ev têgihiştina kûr, ji ber ku xwe dispêre hest, coşî û ferasetê *(sezgiyê);* ji felsefe û zanistê cihêreng e. Lê ji ber ku tiştên ku di xwezayê de dide dest û ji wan, li gor awira xwe tişteke nû diafirîne; xwediyê taybetmendiyeke kirdewar/oznel e û bi vê yekê re jî, dişibe felsefeyê. Herweha di heman babetê de jî, du hunermend dikarin rabin û du hilberên cihêreng hilberînin. Bi vê yekê re jî, qadeka kirdewar e. Dîsa mirov dikare bibêje ku, ji bo huner û teknîkê jî hunerweriyek divê û ev yek jî, taybetmendiyeka huner û teknîkê ya hevpar e. Ji bilî vê yekê, divê em ji bîr nekin ku di roja me de hilberînên

teknolojîk; ji bo ku bikaribin baş werin firotin, pêdiviya wan bi estetîk û pêşnûmayê jî heye.
Zanayiya hunerî, ji têkiliya ku di navbera hunermend û nesneya wî de heye, dertê holê. Hunermend, hest û feraseta xwe tevlî nesneya xwe dike û bi hostetî û marîfet, berhemeke hildiberîne. Di vir de, divê em bibêjin ku xwederbirîna hunermend; ji felsefe, teknîk û zanistê, cihêreng e. Hunermend carinan bi firça xwe, carinan bi casê, carinan jî bi mermerê; hest û feraseta xwe, radixe holê. Di vê wateyê de huner, bi xwezayê re; her dem di nav dijberiyekê de ye. Herçiqas hunermend malzemeya xwe ji xwezayê bigre jî, wesf, rûçik yan jî taybetmendiyeke ku têde tune dide wê û bi vê yekê re jî, estetîk û spehîtî jî tevlî vê pêvajoyê dibe. Zanayiya hunerî, xwediyê hêleka ecibandinê ye jî. Lewra berhema hunerî, her dem dertê pêşiya temaşevan *(guhdaran)* û bi ecibandinekê tê pêşwazîkirin. Kesên ku rastê berhema hunerî dibin, dibe ku hem jî aliyê hest û hem jî ji aliyê zêhnî ve, ber bi asoyên nû ve herin. Bi vê yekê re ew şexs, dibe xwediyê awir û têgihiştineke nû û zêdetir bi pêş dikeve.

## 99- Felsefe, Hunera Fikirînê ye

***Arîstoteles,*** mirovan weke heywanên xwedîaqil dihesibîne û dinasîne. Lewra, taybetmendiya herî cihêreng ya mirov ew e ku mirov xwediyê aqil e û difikire. Yên ku li ser jiyana xwe û mirovên din, li ser gerdûn û xwezayê, li ser wateya jiyanê difikire, dîsa mirov e. Di pêkanîna van xebatan de jî, rêberê mirov aqil û hêmanên aqlî ne. Fikirîna rast û kûr, berhevdan û

komkirina fikirînê, dibe ku wesfa hunerî a tekane ya felsefeyê be.

## 100- Felsefe, Xwe Dispêre Pirsan

Felsefe bi pirsan, bi pirsiyaran xwe nêzîkê yên nenasbar *(kesnezanî)* dike. Ji destpêkê ve felsefeyê bi pirsan û pirskirinê dest bi karê xwe kiriye, ji bo têgihiştina gerdûn, mirov û hilika rasteqîn ya mirovî, xweza û gerdûnê, bêrawestan pirsên xwe pirsî ye û bersivan hilberandiye. Her fîlozofeke pirsên xwe yên xweser pirsî ye yan jî, wan pirsên ku berê hatine pirsîn parve kiriye. **Wekî mînak:** Pirsa *'Gelo çavkaniya zanayiyê çi ye?'* ji bo hemû fîlozofan pirseka hevpar e. Lê**,** ***John Locke*** bi pirsa *'Gelo zanayiyên me ji zayînê ve hene, yan na?'* û **Kant** jî, bi pirsa; *'Bîr/zêhn/hiş dikare bi çi bizanibe û heta çi radeyê dikare bizanibe?'* xwe nêzîkê wê pirsa felsefî dikin. Pirsên fîlozofan ji hev cihêreng bin jî, mirov dikare bibêje ku girîngiya wan her dem didome. Axirê, mirov dikare bibêje ku di felsefeyê de ji bersivan zêdetir, pirs girîng in.

## 101- Şikparêziya Xezalî

Xezalî di destpêkê de ji bo ku bikaribe xwe bigihîne zanayiya rast û misoger, li hemû texlîdên zanayiyê vekola ye. Xezalî li hemû mezheb, agirperest, ateîst û li ramanên fîlozofan vekolaye û xwestiye ku spartek û bingeha angaşt û ramanên wan fêr bibe. Lê herdem derheqê rastiya wan de, di gumanê de bûye. Axirê bi xêra vê yekê beyî ku di bin bandora fikrekî de bimîne, ramanên xwe parastiye.

Herweha wiha bawer kiriye, ku divê mirov bi çavê ti kesî li dinyayê mêze neke û wan texlîd neke. Ji ber vê yekê jî, texlîdkirina fikran; weke xirabiyeka mezin hesibandiye.

Li gorî nêrîna Xezalî divabû du tişt pêk bihatana:
**1-** Destnîşankirina bingeha zanayiya misoger û rast.
**2-** Peyîtandina vê zanayiyê, ku rasterast nesneya xwe vedibêje.

Ji bo hilberandina zanayiya rast û misoger, di destpêkê de prensîpên têgîhan û sehekên me û prensîpên fikirînê yên bivênevê, divê werin destnîşankirin. Lê di dawiyê de, Xezalî dibêje ku sehek û têgîhanên me, xapînok in û dikarin herdem me bixapînin. Ji ber ku ne ewle ne, dikarin eqlê mirovî jî bixapînin. Ji bo vê çendê jî, dibe ku dadgerekê dinê, yekê ku serwerê sehek û têgîhanên me be, derbikeve holê.

Xezalî, ji fikrekê wiha dest pê dike û behsa beradayîtiya vê dinyayê dike. Herweha dibêje ku ev dinya me ya ku em têde dijîn, xewn û xeyalek e û piştî mirinê, dibe ku em hemû heyberên li cîhanê ji rewşa wan ya niha, cihêreng bibînin. Dibe ku ji bandêra dem û cih ya niha, rasteqîniyeke din jî hebe. Û mirov bi alîkariya hişê xwe ya ku di asteka cihêreng de ye, dikare vê siûdê bidest bixe.

## 102- Hezkirina Nirxên Serdestan

Çi dema ku kurd, li Tirkiyeyê wekî neteweyekî werin pejirandin û hemû mafê wan ê şexsî, komelî û civakî bi zagonan werin destnîşankirin û mafê wan ê destnîşankirina çarenûsiyê were qebûlkirin û çi dema ku dewleta dagirker ya tirkan ji bo siyaseta xwe ya hovane û

tunekirinê ji temamiya kurdan lêborîna xwe xwest, a wê demê dibe ku hezkirina me ya alaya wan dest pê bike. Ligel vê yekê, em tucar ji alaya wan netirsiyane û natirsin jî. Tirs tiştek e û hezkirin jî, tişteke din e. Hezkirin jî, bi darê zorê nabe. Lewma jî heta ku meriv heqê xwe li hevdu helal neke, hezkirina ji nirxên neteweyên serdest û zordest, dereweke mezin e û pûç e.

## 103- Felsefe û Lêgerîn

Felsefe, bi riya pirs û pirsiyarkirinê û bi rê û rêbazên aqlî, lêgerîna rastiyê û hewldana têgihiştina yên nenasbar e. Beyî ku serî li tu desthilatdariyan bide û sitûyê xwe xwar bike, li dijî vajbaweriyên qalibgirtî sehildana mirovî ye. Rêwîtiyeke bêdawî û lêgerîna wateya jiyanê ye.

## 104- Felsefe û Civak

Felsefe, divê di nav gel de bijî û bikaribe, xwe pratîze bike. Di civakê de, divê mijarên felsefî bi hêsanî bikaribin werin xeberdan û minaqeşekirin. Xala destpêkê, ya felsefeyê ev e û ev yek; girîng e. Di civaka tirkan de, sebebê kêmasiya *(tunebûna)* fikr û xebatên felsefî yên resen jî, dîsa ev yek e. Felsefe divê ne tenê li zaningehan, divê li her derê û ne tenê bi destê akademîsyenan, divê bi destê her mirovî bikaribe were kirin û afirandin. Lewma Sokrates di nava gelê xwe de digeriya û fikrên xwe, bi wan re parve dikir û dikete guftegoyê. Ez dizanim ku ne karekî hêsan e, lê ne hêsan be jî; ez dîsa dizanim ku pêdiviya me weke nan û avê, bi vê yekê heye.

## 105- Mijarên Felsefî û Wêje

Berhevdan, zanîn û têgihiştina zanayî, mijarên felsefî û her cure zanayiya zanistî, ji bo zimanê kurdî pêdiviyeke mezin e û ji bo zimên jî, dewlemendiyek e. Çawa ku pêdiviya meriv bi edebiyatê hebe, wisa jî bi felsefe û zanistê jî heye.

Zanîn, têgihiştin û bikaranîna zanayiyên felsefî û zanistî, berhema edebî xweşiktir û zengîntir jî dike. Bi saya pirs, fikr û fikarên felsefî, berhema edebî bêtir dibe berhemek xweser û mayende. Ji bo pêkhatina vê yekê jî, pêdiviya me bi xwendin, fikirîn, nivîsandin, xeberdan û minaqeşekirinê heye.

## 106- Li Ser Wesfên Felsefeya Îslamê Çend Gotin

Dema ku em li rojavaya nûjen dinihêrin, em dibînin ku ramana pêşketinê giraniya xwe zêdetir nîşan dide. Ango hest û ramana çêbûnê, pêşdetir e. Ramana rojava, li ser pêşketina dinyayê û li ser şeklê guherînê rawestiya ye. Lewra, ramana rojava ya bingehîn, li ser pirsa zanayiyê digere da ku bizanibe ev zanayî ji ku tên û sînorên vê zanayiyê, çi ne? Beguman di ramana rojavayê de, mirov dikare bibêje ku têgeha zanayiyê li pêş e.

Di Felsefeya Îslamê de jî:

**1-** Ramaneke bêform, bêtevger û neguhor, li ser kar e.

**2-** Pirsa herî mezin, <gelo, di navbera Xwedê û ebdên wî de danûsitandineka/têkiliyeka çawa heye?> ye. Ev pirs jî, me dibe pirsa; <gelo mirov xwedî semax/xwedî îrade ye, yan na?> û <mirov, azad e yan na gelo?>

**3-** Xwestekên mirovan, wateya/arîşa jiyanê, rastî û çewtî û riya jiyaneka rast, li gorî ramana îslamî têne ravekirin. Lewma jî, di di ramana Îslamî de, guftegoya ol û ehlaqê, zêdetir derketiye pêş.

## 107- Aboriya Tirkiyeyê û Keda Kurdan

Ekonomiya Tirkiyeyê, bi saya keda ciwanên kurdan û sermayeya kurd, niha her diçe betir berfireh dibe, geş dibe û dibe ekonomiyekê çalak. Nifûsa Tirkiyeyê jî, her diçe pîr dibe û li gelek bajarên tirkan, tirk êdî naxwazin ku di karên giran de (înşeet, bargirî, pakijî, xizmet, tekstîl û hwd.) de bixebitin. Lewma jî, ev karên giran bêtir ji aliyê kurdan ve têne kirin, ku rêveberên dewleta tirk bi xwe jî, bi vê yekê baş dizanin. Li metropolên tirkan, malbatên tirkan 2 zarokan çêdikin û naxwazin ku zêde zarokan çêkin.

## 108- Hemhestyarî

Rewşenbîr, romannûs, helbestkar, çîroknûs û nivîskarên kurd, dengê dil, hiş û êşa civaka kurd in. Di dewsa çêr, sîxef û dijûnan de, guh bidin gotinên wan. Çimku ew ne siyasetvan in, ew afiranderê hest û ramanên xwe ne û siyasetvan dest ji siyasetê berdin jî, ew dest ji gotina xwe bernadin. Dibe ku gotinên wan ne bi dilê we

be, yan ne li gor siyaseta we be be. Lê ev yek mafê heqaretê nade we. Divê em bizaninin ku pênûsa wan, dengê dil wûjdana wan e. Di dewsa çêr, heqaret û sîxefan de, divê em rêz ji rexne û fikrên wan re bigrin, ew ne dijminên me ne.

Lewre heke di hiş û dilê wan de, hesta kurd û kurdayetiyê tunebûya, wan bi kurdî nedivîsand û dibe ku wan jî a niha di bin sîwana partiyên dagirkeran de siyasetê dikarin. Werin em dest ji wê hişmendiya ku dibêje 'yên ku weke min nafikirin, ew dijminên min in.' berdin û ligel cihêrengiya ramanên hev, ji hevdu re rêz bigrin û guh bidin fikrên hevdu. Lêbelê, dema meriv li malbatên kurd mêze dike, meriv dibîne ku her malbat 5-6 zarokên wan hene û bi pirranî yan didin şuxulandin yan jî didin xwendin. Ev jî nîşan dide ku dewleta tirk û Tirkiye bi xwe jî, pêdiviya wan bi kurdan heye û heke kurd tunebin, dê ekonomiya wan hewqasî jî ne çalak û pêşketî be. Ji ber van sebebên ku me li jor wan eşkere kir, dewlet jî dixwaze ku kurd dest ji axa bav û kalên xwe berdin û berê xwe bidin metropolên tirkan. Li metropolên Tirkiyeyê jî, mixabin dawiya vê proseyê asîmilasyon û otoasîmilasyon e, tunebûnê. Yanî, dewleta Tirkiyeyê bi siyaseteka dûrbîn û bipîlan, kurdan tune dike û nasnameya xwe ya fermî, li ser me ferz dike.

### 109- Nirxên Neteweyên Serdest

Çi dema ku kurd, li Tirkiyeyê wekî neteweyekê werin pejirandin û hemû mafê wan ê şexsî, komelî û civakî bi

zagonan werin destnîşankirin û mafê wan ê destnîşankirina çarenûsiyê were qebûlkirin û çi dema ku dewleta dagirker ya tirkan ji bo siyaseta xwe ya hovane û tunekirinê ji temamiya kurdan lêborîna xwe xwest, wê demê dibe ku hezkirina me ya alaya wan dest pê bike. Ligel vê yekê, em tucar ji alaya wan netirsiyane û natirsin jî. Tirs tiştek e û hezkirin jî, tişteke din e. Hezkirin jî, bi darê zorê nabe. Lewma jî heta ku meriv heqê xwe li hevdu helal neke, hezkirina ji nirxên neteweyên serdest û zordest, dereweke mezin e û pûç e.

## 110- Kesayetî û Kurd

Mala Xwedê ava ku hêjî çend rewşenbîr û nivîskarên me yên pênûshez hene, ku tu carî xwe li kubariya zimanê tirkî yan erebî danaynin. Çimku wan kedek mezin di ber kurdî de dane û bi tu hawî naxwazin ku ew keda wan ya giranbuha bikeve ber bayê berjerwendiyên biçûk yên ku bi saya serê zimanê tirkî dikeve dest. Spas ji bo we camêr û xanimên hêja, sekna we ji bo me teva dibe mînakek gelek baş û helwestek rênîşander.
Lê belê hinek rewşenbîr û nivîskarên me jî hene, ku bi dehan berhem dane zimanê kurdî, lê a niha ji ber bayê populîzm û navdariyê, hemû post û mostên wan yên li ser medya sosyal, bi zimanê tirkî ne. Mixabin, nayê bîra wan ku ew bi yekê dibin mînakên neçê bo gelek ciwanên kurdan. Ez nabêjim ku bi tirkî xeber nedin, ev ne hedê min e. Lêbelê, kesên ku bi navê ‘rewşenbîr, nivîskar, helbestkar, çîroknûs, romannivîsên kurd û hwd.’ derkevin pêşberî raya giştî ya kurd, divê bi zimanê miletê

xwe bang li wan bikin. Çimku zimanê me hêjî ji xeteriya wendabûnê xwe rizgar nekiriye û zimanê serdestên me jî, *(tirkî, erebî, farisî)* ne zimanê fransî yan ingilîzî ne. Zimanê serdestên me, zimanekî asîmîlekar û kêmkar e.

**Çavkaniyên Giştî**


**1-** SEMÎNER 4. Pirtûka vekolanên perwerde, felsefe, civaknasî, psîkolojî û Antropolojiyê. Weşanên Zaningeha Egeyê. Rêbendan 1985. Çapxana Şefeq Îzmîr.

**2-** Budîzm û Felsefe: Rahul Sankrityayan. Weger: Sibel Ozbudun. Weşanên Veguhêrîna Civakî. 1988 Stenbol.

**3-** Semîner 2/3. Pirtûka vekolanên felsefe, perwerde, psîkolojî, civaknasî û Antropolojiyê. Weşanên Zaningeha Egeyê. Berfenbar 1983-Çileyapaşîn 1984. Çapxaneya Tîcaretê/Îzmîr.

**4-** Silk, J. Kurtedîroka Gerdûnê. Weşanên TUBİTAK 1997.

**5-** Kaufmann, W. J. Peresana Gerdûnê û Çêbûna Stêrkan. Weşanên Arkadaş. 1979.

**6-** Hoagland, M.B., Kokên Jiyanê. Weşanên TUBİTAK. 2003.

**7-** Kovara Zanist û Pêşeroj. Hejmar: 50 Sal: 2008.

**8-** Alex Calinias. Ji Postmodernîzmê Re Na.

**9-** Nietzsche. Daxwaza Hêzê.

**10-** Felsefeya Postmodern. weş. Zanist û Hunerê.

**11-** Raman, Pîrozî Û Ol. Gotar. Ali Gurdilî. Netkurd.com

**12-** Louis Massignon. Yên ved: Prof. Dr. Niyazi Öktem.

**13-** Dar- ı Mansur: Rûpel 09- 12 Weşanên Ant.

**14-** Erdoğan Aydın- Kovara Dersim. Sal 3. hejmar 3.

**15-** Yaşar Nuri Ozturk. Hallacê Mansûr û berhema wî: Şehîdê eşq û heqê.Weşanên Yeni Boyut. Çapa çaremîn. Stenbol 1997

**16-** İ. Z. Eyuboglu. Elewîtî- Sûnnîtî û ramana Îslamê. Weş. Der- 1989

**17-** E. Aydın. Peywendiya Elewîtî û Îslamiyetê. Kovara Dersim. H. 5

**18-** Mukrimin Halil Yinanç. Yên vediguhêzîne: Turgut Akpınar: Di dîroka Tirkan de Îslamiyet. W. iletişim.

**19-** Dengê felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Dozê. 2006.

**20-** Încîl. (Mizgînî) Kitabı Mukaddes Şirketi- Kurmanji dialect. Metta 8.

**21-** Rêwîtiyeke Zanistî. Ali Gurdilî. Weş. Doz. Sala 1997 an.

**22-** Destpêka Felsefeyê. John Herman & Justus Buchler. Çapxaneya. Zaningeha Egeyê. Sala 1982 an. NO: 1
**23-** Şerîet û Jin. İlhan Arsel. Weşanên Tumda. Sala 1990 an.
**24-** Dîrok Ji Sumeriyan Dest Pê Dike. S.N. Kramer. Weş. Saziya Dîroka Tirkan. Çapa sêyemîn. Sala 1998 an.
**25-** Semîner. Hejmar 4. Weş. Z. EGEYÊ. Sala 1985 an.
**26-** Destana Gilgamêş. Danny P. Jackson. Weş. Arkadaş.
**27-** Şaristaniya Antik Yewnanî. Andre Bonnard. Weş. Evrensel. No:267
**28-** Civak û Perwerdehî. Prof. Dr. Ercan Tatlidil. Weş. Z. Egeyê. No: 71
**29-** Semîner. Hejmar 1. Sala 1982 an. Weş. Zaningeha Egeyê.
**30-** Kovara Sosyolojiyê. Hejmar 1. Sala 1987 an. Weş. Zaningeha Egeyê.
**31-** Dilêrîna Guherîna Civakî. Anty B. Smith. Weş. Z. Egeyê.
**32-** Semîner. Hejmar 5. Sala 1987 an. Weş. Zaningeha Egeyê.
**33-** Semîner. Hejmar 2/3. Sala 1984 an. Weş. Z. Egeyê.
**34-** Erdoğan Çinar. Hezar salên Wenda Yên Elewîtiyê. Çapa 2 an. Weşanên Çiviyazilari.
**35-** Dewlet. Eflatun. Weş. Akvaryum. Sala 2007 an.
**36-** Sîstemên Siyasî Yên Hemdem. G. Şaylan. Weş. TOAİE ê. **37-** Domanên Ramana Sosyolojîk.Prof. Dr. R. Aron. Weş. İş Bank.. 1986.
**38-** Arîstoteles. Polîtîka. Mete Tunçay. Weş. Pirt. Remzî.
**39-** Semîner. Hejmara 1 ê ya sala 1982 an. Weş. Z. Egeyê.
**40-** Semîner. Hejmara 5 an ya sala 1987 an. Weş. Z. Egeyê.
**41-** Semîner. Hejmara 4 an ya sala 1985 an. Weş. Z. Egeyê.
**42-** Şerxa Varîdatê. S. Muhammed Nur. Sala 1994 an.
**43-** Dîroka Filehtiya Rojhilatê. Weş. Dozê. Aziz S. Atiya.
**44-** Zayîna Felsefeya Zanistî. H. Reichenbach. Weş. Pirt. Remzi. 1981.
**45-** Dîroka Felsefeyê. Prof. Macit Gökberk. Weş. Pirt. Remzi. **46-** Ferhenga Ekonomiyê. O. Hançerlioğlu. Weş. Pirt. Remzi. **47-** Çand û Mirov. Bozkurt Guvenç. Weş. Pirt. Remzi.
**48-** Kovara Dersim. Sal 3. Sala 2004 an. Hejmar 5.
**49-** Kovara Dersim. Sal 3. Sala 2oo4 an.Hejmar 4.
**50-** Kovara Tîrojê. Sal 4. Hejmar 24. Xweza û Dîn.
**51-** Erol Sever. Êzdayetî û Çavkaniyên Êzdayetiyê. Weş. Berfin.
**52-** Dîroka Ramana Sosyolojîk. Prof. Dr. U. Oskay. Z. Egeyê.
**53-** Ferhenga Mîtolojiyê. Azra Erhat. Çap. Remzî. Sala 2006.
**54-** Destpêka Sosyolojiyê. Prof. Dr. Onal Sayın. Weş. Z. Egeyê. 1985.
**55-** Sosyolojî. Ozge Koroglu. Weş. Serhat. Sala 2009 an.

**56-** Mantık. Weş. Fil. Gulşen Oz. Sala 2008 an.
**57-** http://www.felsefevan.org/
**58-** http://www.rewanbej.com/
**59-** Kovara Nûdemê. Hejmar 01-20
**60-** Ferhenga Zanıstên Civakî / Dictionary Of Social Science. Doç. Dr. Abdullah Kiran. Weşanên Nûbihar. Sala 2014 an.
**61-** Dîroka Felsefeyê. Ahmet Cevizcî. Weşanên Say. Stenbol. 2009
**62-** Bi Riya 32 Jêgirtinan Dîroka Felsefeyê. M. Leboeuf. W: Alev Er. Weşanên NTV
**63-** Dîroka Felsefeyê. Cild 2. Afirandina Cîhana Modern. Jacqueline Russ, François Ribes, Alain de Libera, Denis Kambouchner, France Farago, Anne Cheng, François Chenet, Claude Cals, Anne Baudart. Weş. Îletîşîm.
**64-** Dîroka Felsefeyê. Cild 1. Ramanên Damezraner. Weş. Îletîşîm. 2012. Jacqueline Russ, François Jullien, Christian Jambet, Pierre Hadot, France Farago, Jean-Paul Dumont, François Chenet, Anne Baudart.
**65-** Dîroka Felsefeyê. Nils Gilje/Gunnar Skirbekk. Weş. Kesît. Sala 2011.
**66-** Felsefeya Serdema 2o an. C. Delacampagne. W. Îşbank.
**67-** Copleston. Nihîlîzm û Materyalîzm. Weş. Îdea.
**68-** Frederick Copleston. Feydexwazî û Pragmatîzm. Felsefeya Modern. Weşanên îDEA. Çapa duyem.
**69-** Copleston. Ronîbûn. Weş. Îdea. Çapa sêyemîn.
**70-** Dîroka Ramanan. Peter Watson. Weş. YKY.
**71-** Dîroka Ramanê Ya SERDEMA Pêşîn. F. Yilmaz. Weş. Berikan. 2011.
**72-** Felsefeya Antîk. Weş. Dost. Jean Paul Dumont.
**73-** Rasyonalîzm. John Cottingham. 2013. Weş. Doruk.
**74-** Destpêka Felsefeyê. Ali İhsan Candoğan. Weş. Dem.
**75-** Nîqaşên Felsefî. Kovar. Hejmar 40. Weş. <Zaningeha Bogaziçiyê>
**76-** Dîroka Felsefeya Ronîbûnê. Ahmet Cevizcî. Weş. Asa.
**77-** Dîroka Felsefeya Serdema Navîn. A. Cevizcî. Weş. Asa.
**78-** Di Serdema Navîn de Felsefe. Betul Çotukkesen/Saffet Babur. Weşanên Kabalci.
**79-** Dîroka Felsefeya Serdema Pêşîn. A. Arslan. Z. Bilgiyê.
**80-** Dîroka Felsefeya Grek. Eduard Zeller. Weş. Say.
**81-** Gorgîas. Platon. Weş. Say. Sala 2011 an.
**82-** Dîroka Felsefeya Serdema Navîn. Alain de Libera. Werger: Işık Ergüden. Weşanên Dost.

**83-** Felsefeya Serdema Pêşîn Çi ye? / Pierre Hadot. Werger: Muna Cedden. Weşanên Dost.
**84-** Wittgenstein û Sînorên Ziman. W. <Dogu-Batı>
Werger: Murat Erşen.
**85-** Ji Bo Jiyanê Felsefe. Pierre Hadot. Werger: K. Kahveci.
**86-** 50 Fikrên Felsefî Yên Ku Divê Werin Zanîn. Weş. Domingo. 2014.
**87-** Rexneya Ramana Postmodern. Stuart Sim.
**88-** Dîroka Felsefeya Rojava 1. W. T. Jones. Werger: Hakkı Hunler. Weşanên Paradîgma. Ramana Klasîk. Sala 2006 an.
**89-** Dîroka Felsefeya Rojava 2. W. T. Jones. Werger: Hakkı Hunler. Weşanên Paradîgma. Ramana Serdema Navîn.
**90-** Kovara Nûdemê. Hejmarên 01 - 20. Weşanên Nûdem.
**91-** Dîroka Felsefeya 17 an. Ahmet Cevizcî. Weşanên Say.
**92-** Destpêka Felsefeyê. Ahmet Cevizcî. Weş. Sentez.
**93-** Felsefeya Ehlaqê. Etîk. Ahmet Cevizcî. Weş. Say.
**94-** Felsefeya Perwerdehiyê. Ahmet Cevizcî. Weşanên Say.
**95-** Platon. Ahmet Cevizcî. Sala 2014. Weşanên Say.
**96-** Kovara Felsefevan. Hejmar 01,02,03- Sala 2015an.
**97-** Destpêka Felsefeyê. Alî Gurdilî. Weşanên Soran.2015
**98-** Antolojiya Feylesofan. Alî Gurdilî. Weş. Soran. 2015

**&**